

## Li Girtîgeha Êlihê jî 'rojiya mirinê'

Li Girtîgeha Êlihê (Batman) girtiyan, di 14'ê gulanê de greva birçîbûnê qulibandin 'rojiya mirinê'. Piştî ku girtiyan grev qulibandin rojiya mirinê li girtîgehê pest û êrîşên li ser girtiyan diwartir bûn. Li gorî agahiyan, rêveberiya girtîgehê, li hemberî girtiyan dest bi êrîşan kirine, lê li dijî van neheqîyan, berxwedana girtiyan jî berdeham e.

Rûpel 4

## Di şanoyê de jî dewra kurdî

Di nav hefteya borî de (7-15 gulan) Şanoya Hêvî li Stenbolê liştikeke ku xwerû bi kurdî bû, pêşkêşî temaşevanan kir. Koma Şanoya Hêvî, bi Navenda Çanda Mezopotamya şaxê Izmirê ve girêdayî ye. Navê liştika wan, Sîmûrg û Ronahî ye û derhêner û nivîskarê senaryoyê jî Hüseyin Umaysız e. mijara liştikê, nirxandin û rexneya 'rewşenbîrên' kurd e.

Rûpel 12

## Meha bîranîna şehîdan

Meha gulanê meha têkoşîna gelê cihanê ye. Lê zêdetir li Kurdistanê wisa ye. Doza Kurdistanê azad û bi serbixwe di dîroka kurdan de bûye sedema gelek şehîdbûnan, hejmarê wan bi hezaran e. Di navbera van şehîdan de yên ne kurd jî hene. Lê çî kurd, çî tirk an jî ereb, taybetîyan van şehîdan a hevpar têkoşîna ji bo mirovahiyeke azad bû.

Rûpel 7

## Mîrê me girtin lo mîro, birin Stenbolê pismîro

Mîrê Botan Berdirxan Begê navdar, berî serhildana li hemberî Osmaniyên kedxwar, sala 1842'yan, di gel hin mîrên kurdan ên deverê "Peyamana Pîroz" çêkir. Pêşengên ku ketin civînê, ji bo parastina hikûmeta kurd soz dan û sond xwarin.

Rûpel 13



## MED'ê dest bi weşana esasî kir

● TV MED, di 15'ê gulanê de jî dest bi weşana esasî kir. Wek tê zanîn TV MED'ê, di 30'ê adarê de ji paytexta Îngilistanê ji Londonê dest bi weşana testê kiribû.

● Ji bo kurdên Kurdistanê Bakur televîzyona bi kurdî, bi gotineke din televîzyona kurdan, wekî xeyalekê bû. Lê îro kurd jî xwedî televîzyonekê ne.

Rûpel 2

# Welatê Me


ROJNAMEYA HEFTEYÎ

SAL: 1 HEJMAR: 27

21 GULAN 1995

BUHA:40.000 TL(KDVD)

## 'PKK TEQÎNA HÊRSA KURDAN A SED Û PÊNCÎ SALAN E'



Rewşenbîrê kurd A. Zeki Okçuoğlu li ser PKK'ê û siyaseta kurdan ji bo Welatê Me peyivî

● Li Tirkiyeyê wekî her hereketa radikal, PKK'ê jî hêz û dînamîka derketin û pêşketina xwe ya esas ji siyaseta rêveberiya tirk stand. Komara Tirkiyeyê (KT) her kesê ku mafan dixwaze bi metodên şidetê dicîqîne, ji bilî vê metodê tu şensê nade kesî.

● Heta vê gavê dihat hesabkirin ku bi guherîna KT'ê wê PKK jî sehneyê rabe (derkeve), lê êdî hate dîtin ku ev fikr nerast e. Fikra hakîm (serdest) terefdarê guherîna herduyan e. PKK di xweguherînê de ji KT'ê zûtir hereket dike. Di kongreya PKK'ya dawîn de gelek guherînên ber bi çav çêbûn.

Rûpel 8-9

## HESEN KUŞTIN

Hasan Ocak jî, kete nav karwanê şehîdên failî-nemeçûlan



Rûpel 3

**Ji Rojêve**

**DEMA  
SAZÎBÛNÊ**

**"Kurd ne netewe (milet) ne, ew 'Tirkên Çiyayî' ne. Zimanê wan jî ji çend peyvên biyan pê ve ne tu tişt e. Zaten ew jî ji hev fêhm nakin. Dev ji avakirana dewletê berdîn, ew nikarin saziyekê jî ava bikin. Jixwe gava em welatê ku dixwazin bidin destê wan jî, wê di çend mehan de hevûdin qir bikin û welatê xwe teslîmî dewletên din bikin." Peyvên jor, berî niha bi demekê (û hîn jî gelek biyan dibêjin) pir dihat gotin. Lê êdî bi dilekî rehet mirov dikare bibêje ku kurd bi xebatên xwe yên berbiçav, dikarin bersivên van derdoran bidin. Piştî avakirina Parlamentoya Kurd, TV-MED jî bo kurdan bû mizgîniyeke bêhempa. Lazim e êdî kurd van saziyan hem zêde bikin û hem jî bi awayekî profesyonel bigerînin (îdare bikin). Êdî kurd ne bêhêvî ne, lê ew xebatên ku wê bînin kirin jî, divêt bi rêkûpêk û bi medot bê kirin.**

**Êdî kurd jî bi televizyon in**

Piştî avakirina televîzyona MED'ê, di çapemeniya kurdî de valahî tê dagirtin

**TV-MED, di 15'ê gulanê de jî dest bi weşana esasî kir. Wek tê zanîn TV MED, di 30'ê adarê de ji paytextê Îngilîzstanê jî Londonê dest bi weşana testê kiribû. Ji bo kurdên Kurdistana Bakur televîzyona bi kurdî, bi gotineke din televîzyona kurdan, wek xeyalekê bû. Lê îro kurd jî xwedî televîzyonekê ne.**

Ji bo kurdên Kurdistana Bakur televîzyona bi kurdî, bi gotineke din televîzyona kurdan, wekî xeyalekê bû. Lê îro kurd jî xwedî televîzyonekê ne. Navê

wê, navê qewmê kurdan yên berê, ji Medan tê.

TV-MED, di demeke kurt de di nav xelkê de tesîreke mezin çêkir. Hem li hemû bajarên Kurdistanê û hem jî di nav kurdên ku li bajarên biyan rûdin de, kirîna antênên peykê, ji sedî % zêde bûn. Li gorî agahiyên ku ji Kurdistanê ketin destê me, cerdevan jî antênan dikirin.

Wek tê zanîn TV-MED'ê, di 30'ê adarê de ji paytextê Îngilîzstanê jî Londonê dest bi weşana testê kir. TV-MED'ê, di 15'ê gulanê de jî dest bi weşana esasî kir.

TV-MED, ji ber îhtiyaciyan kurdan yên neteweyî, hate avakirin.

Rewşa gelê kurd û welatê wan Kurdistanê hewcedariya saziyeke wiha derxist holê. Zimanê kurdî, tevî çandê bi salan e di bin tesîra zimanên biyan (tirkî, erebî, farisî û hwd) de, ber bi windabûnê ve diçû. Asîmilasyon, wek vîrusekê ketibû nav kurdan û hê jî ev dewam dike. Lê êdî kurd, di vî warî (di hêla wasitayên dîtbarî) de jî rê li ber êrîşan digirin û ji bo derxistin û pêşvebirina çand û zimanê kurdî, gavan diavêjin. Wek tê zanîn di yekkirina zimanê gelekî de wasiteya herî muhîm, televîzyon e. Helbet wê televîzyon tenê nebe wesitaya jîndariya çand û zimanê kurdî, wê ji her aliyê ve bibe guh û çavê



**Ji bernameçêkerên Televîzyona MED'ê Dilbixwîn Dara xwedî kurdiyêke fesîh û herikbar e.**

**Bernameyên MED'ê**

Televîzyona MED'ê di weşanên xwe de cih dide bernameyên cur bi cur, ji filmên sînemayê heta bi xêzefilm (kartûn) jî bernameyên ji bo zarokan, heta bi yên li ser mirovên li welatên xeribiyê.

Hekê em navê çend bernameyan û mijara wan bidin. Di bernameya "Gotûbêj"ê de meselên girîng tên muneqesekirin. Ji bo numûne di vê bernameya 18'ê mehê de li ser yekkirina zimanê kurdî munaqêşe hatin kirin.

Di bernameya bi navê "Kamera me li mala we ye" de bi malbatên kurd re hevpeyvîn, di "Şox û Seng" de ji muzik û govend, di programê bi navê "ser

çavan de ji cih didin xwestin û daxwazên gel.

"Pîrs û Bersiv" navê bernameyêke din a televîzyona MED'ê ye, mêvanek beşdar dibe û pîrsan dibersivîne.

"Rojbaş Mamoste" navê bernameya ji bo zarokan e. Ji aliyê din ve "Kalê çirokêbêj" jî heye û çirokan dibêje.

Nûçeyên ji Kurdistanê bi navê "Deng û behs" bi kurdî û tirkî tê pêşkêşkirin. Filmên wekî "Dîlan" û "Umut (Hevî)" bi kurdî hatin pêşkêşkirin. Di bernameyan de zaravayê kurmancî, soranî, zazakî û zimanê tirkî tên bikaranîn.

kurdan. Bi xêra saziyên wiha, wê rê li ber qetlîam, fen û listikên dijminên kurdan bê girtin, der barê şerê ku li Kurdistanê bi wesitaya çapemeniyê tê ajotin de, gelê kurd wê bê agahdarkirin. TV-MED, wek li jor jî hate gotin, wê bibe çav û guhê kurdan. Li hemberî şerê psîkolojîk, wê rayagiştî ya Kurdistan û Tirkiyeyê agahdar bike û ji bo têkoşînê bibe piştgir. Ji roja ku TV-MED hate avakirin û bi vir de berpirsiyarên dewleta tirk, gelek rê ceribandin ku rê li ber weşana wê

bigirin, lê bi ser neketin. Li hemberî avakirina wê, propaganda li nik dewletên ewrûpayê hate kirin û xwestin ku wê wekî saziyeke PKK'ê nîşan bidin. Bi vê riyê jî ew dixwazin MED'ê bidin girtin. Lê hergav berpirsiyarê MED'ê diyar kirin ku ew televîzyona kurdan e û têkiliyeke wan ya dîrekt bi tu rêxistinê tune ye. Erê, êdî dikare bê gotin ku televîzyona kurdan jî heye. Avakirana MED'ê bû destpêka avakirina Medyaya kurd ya dîtbar jî. Navenda Nûçeyan

**Reuters: TV'ya kurdî dengê neteweyî ye**

Piştî destpêkirina weşana esasî ya TV-MED'ê ji ajansa Reutersê Aliza Marcus nivîsek ragihand aboneyên xwe. Marcus di nivîsa xwe ya nûçe-şiroveyî de li ser reaksi-

yonan kurdan û rayedarên tirk yên li hemberî weşana TV-MED'ê disekine. Li gorî agahiyên ku ew di-de, karsazekî kurd li ser televîzyona kurdî wiha dibêje:

"Her roj di navbera seatên 19 û 22'yan de hûn karin min li vir, li ber televîzyonê bibînin. Bifikirin di dîrokê de cara yekemîn e, televîzyona me ya ku li seranserê cîhanê weşanê di-

ke, heye." Marcus dide zanîn ku rayedarên tirk, li hemberî weşana TV-MED'ê zehf aciz dibin, lê tiştê ji destê wan nayê.

Dîplomatekî ewrûpî dibêje: "Tirkiye pir hêrs dibe, lê li şûna ku xwe aciz bike, divê ew jî bo afirandina mercên baş (ji kurdan re), kar bike. Nivîskar dibêje ku piştî xebatên kurdên li Ewrûpayê, di wexta serdestiya teknolojiyê de karê Tirkiyeyê yê înkarkirina nasnameya kurdan pir dijwar e. Li gorî nivîsê, rayedarên televîzyona kurdî rista televîzyonê wekî bipêşvebirina nasnameya neteweyî ya kurdan nîşan didin.

Navenda Nûçeyan

Navenda Nûçeyan

**Al: "Tirkiye helikopterên DYA'yê li dijî sivîlan bi kar tîne"**

Bûroya Rêxistina Efüyê ya Navneteweyî a Washingtonê (Amnesty International) raporeke nû weşand. Di raporê de tê diyarkirin ku komara tirk di têkoşîna bi PKK'ê re helikopterê 'Skorsky, Super Copra' û sîlehên cur bi cur yên ku Dewletên Yekbûyî yên Ame-

rîka (DYA) çêkirine, bi kar tîne. Di rapora ku bi navê, "Mafên Mirovan û Alîkariya DYA'yê ya Ewlekariyê" hatiyê weşandin de, eşkere dibe ku li Kurdistanê di şerê navbera-hêzên artêşa tirk û hêzên ARGK'ê de, artêşa tirk sîlehên ku DYA çêkiriye, bi

kar tîne û ev sîleh gelek caran jî li hemberî sivîlan tên bikaranîn. Rapor wiha didome: "Helikopterên ku Tirkiyeyê ji DYA'yê standine, di girtina ser gundên kurdan de tên bikaranîn. Di van operasyonan de gelek caran gundî tên windakirin û gundên tîrêşewitandin. Gundiyek bi

navê Ali Karaca, piştî ku tê girtin bi helikopterê ve tê girêdan û helikopter wî li hewayê digerîne." Li gorî peymanên nav Tirkiye û Amerîkayê divê Tirkiye van sîlehan di hundirê xwe de û li hemberî sivîlan bi kar neyne.

Navenda Nûçeyan



\* Ji bo rakirina madeya 8'an ji Qarûna Anti-Terorê, Demîrel got ezê ji leşkeran bipirsim!...

EHM!... GELO DIXWAZIM TISTEKÎ... EHM!... BIPİRSIM...

HAA! ÇI? TUYÊ ÇI BIPİRSÎ Sİ-LEYMAN...

...KURTENÜÇE...

Xelata Bruno Krayski jî gihîşt Leyla Zana

Mebûsa DEP'ê ya Amedê, Leyla Zana piştî xelatên Rose û Aachen îcar jî layiqî "Xelata Bruno Krayski a Mafên Mirovan" hate dîtin. Leyla Zana zêdeyî salekê ye ku di Girtîgeha Navendê a Enqereyê de ye. Xelata Bruno Krayski îsal di gel Zana, Parêzera Mafên Mirovan a Filîstinî Zamaya Ferhat Nasir, Üris Sergi Kovalyov û Nîjerî Ken Sorinya jî standine. Xelat wê 29'ê rezberê li Vîyana bi merasimê bi-gihîje xwediyar.

Navenda Nûçeyan

YCK'ê konferansa xwe ya 8'an li dar xist

Li Berlîna Almanyayê, Yekîtiya Ciwanên Kurdistanê (YCK) konferansa xwe ya 8'an roja 13'ê gulanê li dar xist. Gelek ciwanên Kurdistanî beşdarî koferansê bûn û di konferansê de li ser rewşa Kurdistanê û dinyayê ya dawî gengeşiyên berhemdar çêbûn. Beşdar li ser pirsgerêkên xortên kurdan yê li Almanyayê dijin ji bi dorfirehî sekinin. Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî ji kofersê re mesajek bi rê kir.

Kurd-A

Rojnameyeke bi tirkî û kurdî

Li Stenbolê rojnameyeke nû di 21'ê gulanê de bi navê "Ronahî" dest bi weşanê dîke. Rojnameya Ronahî bi kurdî-tirkî derdikeve û rojnameyeke hefteyî ye. Xwediyê rojnameyê Şemseddîn Çelik û Berpirsiyarê nivîsaran jî Sertaç Kılıç e. Di kadroya nivîskarên Ronahî de; Ferhad Can, Server Tanilli, Munir Ceylan, Mehmet Uzun, İbrahim Aksoy, Cezmi Ersöz, Mahmut Alınak, Edip Polat, Koray Düzgören, Sabah Kara balê dikişînin ser xwe.

Navenda Nûçeyan

Gerîla bi ser Tugayê ve girt

Gerîlayên ARGK'ê di navbera Şirnex û Cizîrê de bi ser Tugaya Komandoyan de girtin. Di 15'ê gulanê de saet li nêzîkî 9'ê êvarê gerîlayan bi roketan êrişî Tugaya Komandoyan kir. Piştî êrişî di navbera gerîlayan û leşkeran de şer derket. Şer heta berê şevqê dewam kir. Li hêla din li gundê Bizelê ku li ser Şemzînan e, di 13'ê gulanê de gerîlayan êrişî Qereqola Jandarmayan kirin, 4 leşker mirin, 6 leşker jî birîndar bûn.

Navenda Nûçeyan

Hesen Ocak jî kete nav karwanê faîlî-nemeçhûlan

HESEN KUŞTIN

Nav, Hesen, paşnav Ocak. Di sala 1965'an de li Pûlûrê li bajarê Kurdistanê li Dersimê hate dinyayê. Belkî ew torinê Seyid Rizo bû, kî dizane? Lê tiştêkî rast hebû ku ew kurd bû. Belkî nizanîbû wê aqûbeta ku hatibû serê kalkê wî Seyid Rizo, rojekê derkeve pêş wî jî. Bêşik haya wî ji Arjantînê hebû, ku li wî welatî bi dehhezaran kes hatin revandin û winda kirin. Û dîsa bêşik haya wî ji welatê wî ji Kurdistanê hebû ku gelek kurd, li dûrî welatê xwe ji ber şerê qirêj dibin armanca terora dewletê, yanî tîn revandin û winda dibin.

Hesen Ocak çawa hate revandin?

Di 21'ê adarê de polisên sîvîl, Hesen Ocak ji taxa Stenbolê ji Aksarayê dixin binçav, yanî direvînin. Piştî

revandinê, gelek kes li avahiya emniyeta Stenbolê rastî wî hatine, lê berpirsiyarên dewletê ev yek heta roja cendekê wî hate dîtin jî qebûl nekirin. Li gorî otopsiya doktoran, ew piştî revandinê bi 5 rojan, yanî di 26'ê adarê de, bi ben tî fetisandin. Di eynî rojê de jî gundiyan li nêzî Stenbolê gundê Bozhanê cendekê wî dibînin.

Wek tî zanîn, malbata wî cih nema ku serî lê neda. Lê her gav eynî bersiv dihat dayîn; 'Haya me jê tune ye'. Birayê Hesen Ocak Hüseyin Ocak, diyar kir ku ev metodên bi vî rengî, li Almanyayê di dewra Hitler de hebûn. Hüseyin Ocak dibêje; "Em li welatekî ku şer lê he-



Navenda Nûçeyan

Serokê Hava-İş'ê Ayçin hate girtin



Li ser axaftina xwe ya di xwepêşdana Komeleya Mafên Mirovan de Serokê Hava-İş'ê Atılay Ayçin, ji ber Qanûna Tekoşîna bi Terorê re ya madeya 8'an hate girtin.

Serokê Hava-İş'ê ji ber axaftina xwe ya di xwepêşdana "Mafên bîngehîn, azadî û demokrasî" de ji aliyê Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DED) ve hatibû darizan-

din. Di dawiya darizandinê de DED'a 2'yan a Stenbolê, salek û heşt meh heps û 41 milyon lîraya tirk (TL) jî cezaya pereyê dabû wî. Ayçin piştî ku cezayê wî, Dadgeha Bilind tesdîq kir ji aliyê Şubeya Tekoşîna li dijî Terorê ve hate girtin. Ayçin li DED'ê ji aliyê dozger ve hate tewqîfkirin û dozger ew şand Girtîgeha Bayrampaşayê.

Navenda Nûçeyan

DIK

Şer mîdeya leşkeran kul kir

Li gorî lêkolînên dewletê û rêxistinên sîvîl di nava leşker, polis û tîmên taybet de ji stresa şer û tirsê di sêdî 90'ê wan de ûlsera hatiye tesbît kirin. Nexweşiyên psîkolojîkî yê cur bi cur jî di sêdî 80'yê wan de hatiye dîtin. Ev yek di lêkolînên firmayên dermanan de jî dertê holê. Li gorî lêkolînên firmayan jî nexweşiyên herî zêde kulbûna mîdeyê û nexweşiyên psîkolojîkî in. Nexweşiyên psîkolojîkî jî; întîxar, cînet, dîtina halûsî-nasyona û sinîrbûn e. Pîsporan li ser vî yekê gotin ku piştî şerê Vietnam û Kendavê di nav leşkerên amerîkî de jî nexweşiyên ji van cureyan derketibûn. Û ev nexweşî bi navê "Sendroma Vîetman" hatibûn binavkirin. Dîsa pispor bi me didin zanîn ku piştî şerê Vîetnamê leşkerên ku di şer de cih girtibûn li Amerîkayê di jiyana civakî de bûbûn pirseke giran.

İSMET ÜSİF

Rayedarên girtîgehan ji bo çareserkirina pirsgerêkan tu tiştî nakin

# Li Girtîgeha Êlihê jî 'rojiya mirinê'


**Malbatên girtiyan jî zarokên xwe bi tenê nahêlin û ji bo ku rewşa girtîgehan baştir bibe dest bi çalakiyên ji hev cihê dikin. Yek ji van çalakiyan jî livbaziya xwebirçihîştinê ya malbatên girtiyan e.**

mirovahî di greva birçîbûne de ne. Rewşa wan a tendûristiyê (sihetê) her diçe xerab dibe. Di hevdîtînen navbera nûnerên girtiyan û rayedaran de, ji ber tewra rayedaran a neyînî tu encam derneket. Rayedar jî bo çareserkirina probleman xwe nadin ber tu çareserkirinan û hewl didin ku bi pest û cerdan berxwedana girtiyan bişkînin. Piştî vê yekê nûnerên Girtîgeha Êlihê daxuyandin ku ji roja 14'ê gulanê ve greva xwe ya birçîbûnê, qulibandine 'rojiya mirinê'.

rinê bikin. Heyet, li Enqereyê wê bi nûnerên Komeleya Mafên Mirovan û rayedarên Wezîriya Dadê re ji bo çareseriya 'rojiya mirinê' hevdîtinan pêk bîne.

### Li dijî pest û cerdên girtîgehan greva birçîbûnê

Li navenda HADEP'a Stenbolê, ji bo protestoya cerd û pestên di girtîgehan de komêk lêzîmên (eqrêbe) girtiyan dest bi greva birçîbûnê ya bêmudet kirin. Ji rayedarên HADEP'a Stenbolê Ali Ekber Oğuz û Cemile Gündoğan û 40 lêzîmên girtiyan civîneke çapemeniyê li dar xistin. Di civînê de lêzîmeke girtiyan, ji bo çapemeniyê daxuyaniyek xwend. Di daxuyaniyê de ev hate gotin: "Pest û cerdên ku îro di girtîgehan de diqewimin, ne kêmi yên 12'yê îlonê ne.



**Wezîrê Karê Dadê yê Tirkiyeyê Mehmet Moğultay, ji bo çareseriya pirsgerêkan girtîgehan, wisa xuya ye bêraye ye.**

Li Girtîgeha Êlihê (Batman) girtiyan, di 14'ê gulanê de greva birçîbûnê qulibandin 'rojiya mirinê'. Piştî ku girtiyan grev qulibandin rojiya mirinê li girtîgehê pest û êrîşên li ser girtiyan diwartir bûn. Li gorî agahiyan, rêveberiya girtîgehê, li hemberî girtiyan dest bi êrîşan kirine, lê li dijî van neheçiyên, berxwedana girtiyan jî berdewam e.

Demêke dirêj e girtiyan di Girtîgeha Êlihê de ji bo mafên xwe yên

Girtî îro jî di girtîgehan de ji bo protestokirina pest û cerdên hov xwe dişewitînin. Em ji vê gavê ve sekinandina van êrîşan dixwazin û ji bo vê yekê dest bi greva

birçîbûnê ya bêmudet dikin." Piştî xwendina daxuyaniyê beşdarên bi grevê jî pêkûti û cerdên li ser girtiyan protesto kirin.

Navenda Nûçeyan

Navên 5 kesên ku di xaçepirsa hejmara 25'an de peyva veşarî 'Gelemperi' dîtine û pirtûka "Qaqlîbaz" qezenc kirine:

Muhammed Xwenas Êlih

Mustafa Aladağ Mersîn

Ramazan Cihan Balıkesir

Beşir Bayram Amed

Meral Akdağ İzmîr


## XAÇEPIRSA BIXELAT (25)

1	N	M	A	A	U					
W	E	L	A	T	P	A	R	Ê	Z	Î
R	A	D	E	S	Î	Î	R			
K	U	Ç	E	E	A	G	E			
D	Î	R	O	K	T	E	R	M		
X	A	N	Î	Ö	P	Ê	R	A		
E	N	D	A	M	Ş					
E	L	O	K	A	X	A				
E	M	E	V	Î	N					
E	N	Î	Ş	K	Ç	O				

PEYVA VEŞARÎ → GELEMPERİ

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, em dinixînin. Xelat bi rîya pişkê li 10 kesan tén belavkirin. Xelata hejmara 27'an; qaseta "Şemal" e. Ev qaset ji aliyê **Koma Azad** ve hatiye dagirtin û berhemeke Navenda Çanda Mezopotamyayê ye. **Jérenot:** Ji bo ku bersiva we bê nixandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

### Xelata Xaçepirsê



"Şemal" KOMA AZAD

## XAÇEPIRSA BIXELAT (27)

Qirêj	Nave mehekê	Gihanekek	Teyrek	Pereyê Japonan	Çiyayek li Serhedê
Xweşik	Esir		Notayek	Bi îngilîzi tîjî	
			Zitîk		
			Çav		
Pivaneke doriyê	1	Fuhi, giyanî			
Faaliyet		Bi zerî ve			
			Beyreq		Hêlîn
			Sulh		
Helbestvan (di wêna de)	Aydın			Notayek	
				Têgîneke muzîkê	
4			Navok	5	
			Qelş		
		Bêav		Osmiyûm	Berovalliyê ron
		Tene		Evin	
Rezîl					Celebek şanoya Japon
Jarî, rebenî					
Berkelyûm				Madeyek kîmyewî	



PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5

# Mayîn: Belaya serê welatên bindest

Ji aliyê pisporan ve mayîn wekî çeka ku mirovan bera bera di-kuje, tê binavkirin. Niha li ser rûyê 30 welatên ku bûne qada şer û hê jî lê şer heye, mayîn dibe sedema mirina gelek mirovên ku piraniya wan sivil in.

Tiştê ku bikaranîna mayînê cazîp dike jî ev e; bicihkirina wê erzan û hêsan, lê paqijkirina wê

buha û dijwar e. Li gorî agahiyên buhayê mayînekê li piyaseyê tenê 6 dolar e, lê paqijkirina wê dibe sedema mesrefekî bi qasî hezar dolarî. Divê bê gotin ku mayîn guhnade tu lihevkerin û agirbestan, ji ber ku piştî şer, bi salan jî dibe sedema kuştinan. Tê zanîn ku mayînen ji şerê cihanê yê duyemîn mayî, li Polonyayê heta sala

1977'an jî her sal dibû sedema mirina 30-40 kesî.

Tiştê ku balê dikişîne ser xwe ev e; bi piranî welatên ku li dijî kolonyalîzmê şerê serxwebûnê dane an jî didin serê wan di vê belayê de ye. Niha li ser rûyê erdê sed milyon mayîn di bin erdê de bicihkirî ne. Hê jî her sal 2 milyon heb mayîn tenê bicihkirin. Ji

xeynî mirovên ku tîr kuştin an seqet dimînin, mayîn dibe sedema ku gelek cih çol û beyar bimînin. Tê gotin ku li hin welatan hebûna mayînan erdên bijûn vala dihêle û ew jî dibe sedema xizaniya wan welatan. Heta hin caran mirov mirinê didin ber çavan, dikevin nava erdên ku mayîn lê hene.

Her wiha welatê Kurdistan jî ji mîj wekî qada şer e. Dagirkeran Kurdistan kirine çar parçe, li ser sînor herêmên tampon avakirina, ev herêm jî bi mayînan tijî kirine. Tê zanîn ku di bazirganiya di navbera parçeyên Kurdistanê de ku wekî karê kaçaxiyê tê binavkirin, ji ber van mayînan bi hezaran mirovên kurd mirine an jî seqet mane. Piştî şerê çekdar jî hêzên dagirker her derê Kurdistanê kirine zeviyên mayînan.

Çavkanî: New African, gulana 1995'an

SAMÎ BERBANG



Tê gotin ku armanca sereke ya mayînen anti-personel bêkêrhiştina mirovan e.



Têkiliyên Îngilîstan û IRA'yê didomin feqet;

## Riya aştiyê bi kend û kosp e

**Rayedarên Îngilîz naxwazin mafê çarenûsî yê gelê îrlandayê binasin, lê pêvajo wan mecbûr dihêle ku bi Sinn Feinê re rûnin. Ji ber vê yekê hikûmeta Îngilîz gavên xwe sist diavêje.**

Heşt mehan piştî agirbesta (şerrawestina) Artêşa Komarî ya Îrlandayê (IRA) di 10'ê gulanê de nûnerên hikûmeta Îngilîz û Sinn Feinê cara yekemîn bi awayekî eşkere li hev rûniştin. Di lihevrûniştina li Belfastê de li ser navê hikûmetê Micheal Ancram, li ser navê Sinn Feinê jî Martin McGuinness beşdar bûn. Her çiqas hikûmetê ev civîn wekî civîna heva-

gahdariyê binav kir jî, pêkhatina civînê wekî gaveke girîng tê dîtin. Tê zanîn ku herdu alî jî salên 1970'yî bi vir ve, bi awayekî nependî hevdi-tinan pêk tînin.

Piştî ku di dawiya sala 1994'an de IRA'yê şer rawestand, dihat hêvîkirin ku di demeke kin de gavên mezin bînin avêtin, lê gengeşiyên heta niha didin zanîn ku riya aştiyê bi kelem e. Sedema zû nemeşîna pêvajoyê jî

bi tewra hikûmeta Îngilîz ve tê girêdan. Hikûmeta Îngilîz dixwaze ku IRA bi temamî çekên xwe ji holê rake, lê bi xwe di warê vekişandina hêzên çekdar û jî çekdaran paqijkirina herêmê de tu gavan navêje. Tê gotin ku hikûmet di warê aştiyê domdar (berdewam) de nejidil e û naxwaze mafê çarenûsiyê yê gelê îrlandî nas bike. Lewma ew naxwaze Sinn Feinê wekî hêzêke siyasî bipejirîne. Bi hevkarên xwe ku li dijî mirovên sivil livbazi-yên dijmirovî pêk tînin re rûdine, lê şert û mercan datîne ber Sinn Feinê. Hevkarên dewleta Îngilîz ên li herêmê piştî her gava ber bi aştiyê ve, dengê xwe bilind dikin û hikûmet jî ji ber ku di parlamentoyê de hewce-darê rayên Partiyên Unionîst (yekîtxwaz) e, gavên xwe sist diavêje. Serokê Partiya Unionîst Rev Ian Paisley lihevrûniştina dawîn jî protesto kir.

Nûçeyên Derve



Anoran (li aliyê çepê) û ji Sinn Feinê Martin McGuinness (li aliyê rastê)

### Carlos Menem dîsa li ser kar e

Di hilbijartina roja 14'ê gulanê de li Arjantînê Serokê berê Carlos Menem hate hilbijartin. Li gorî agahiyên ajansan tevî rexneyên kesên ku jî kirinên cuntayê zirar dîtine, Carlos Menem jî sedî 49.1'ê reyan girtine. Bi vê encamê pêdivî bi pêngava duyemîn nema. Heke di hilbijartinê de jî sedî 45'î kêmîtir rey bîstada, wê pêngava duyemîn çêbûya. Li gorî encama hilbijartinê berendamê koalîsyona çepgir Frepaso Jose Bordón jî sedî 30.8, berendamê Partiya Peronîst Horacio Massaccesi jî sedî 16 rey standin.

Serok Carlos Menem van rojên dawî jî ber ku navên kesên ku tevî şerê qirêjî bûne îlan nekîr, rastî rexneyên tûj hat. Meha çûyî hinek endamên artêşê li xwe mikur hatibûn. Di destpêka vê mehê de fermandarê giştî û fermandarên hêzên hewayî û bahrê jî bo kirinên di dema cuntayê de ji gel lêborîn xwestibûn. Derdorên maf-waz û mirovhez qîma xwe bi lêborînê naynin û darizandina sûcdaran dixwazin. Di dema Menem de li Arjantînê enflasyon jî sedî 5 hezarî daket dora jî sedî 20'an, lê niha bêkarî wekî pirs-girêkekê derdikeve pêşberî wî. Menem di axaftina xwe ya piştî hilbijartinê de got ku ewê, rêjeya bêkariyê jî sedî 12'yî daxîne jî sedî 6'an.

Nûçeyên Derve

### Protestoya dêrên alman

Li Almanyayê 200 dêran bi sebaba ku li Tirkî-lyeyê mafên mirovan nîn e û penaberên ku wê werin îadekirin di talûkeyê de ne, deriyên xwe ji wan re vekirin. Piştî vê yekê rayedarên dewleta alman daxuyandî ku, dêr di vê mijarê de ne xwedî sifateke fermî ne û xwedîbiryar, dewlet e.

Dewleta alman der barê mafên mirovan de bi taybetî jî li hemberî penaberên kurd qaîdeyên navneteweyî nade ber çavan. Ev yek di îadekirina penaberên kurd de bi awayekî zelal dertê holê. Li ser vê yekê dêrên Almanyayê siyaseta dewleta alman bi taybetî ya li ser penaberên kurd necibandin û deriyên xwe ji wan re vekirin. Ev biryara dêran di meha adarê de, di Konferansa Pîskoposan de hate standin.

Tê zanîn ku hikûmeta alman dixwaze penaberên kurd îadeyî Tirkîyeyê bike. Ji bo vê yekê jî di navbera hikûmeta alman û ya tirk de hevdi-tin û têkilî didomin. Li gorî agahiyên çapemeniyê, hikûmeta alman di meha borî de nêzikî sed penaberên kurd bi şûn ve şandine Tirkîyeyê.

Navenda Nûçeyan

FAL



**BĒRAN (21 Adar - 20 Avrêl)**

Hûn ji xwe pêştir li tu kesî nafikirin. Lewma mirov ji we direvin, heke hûn dev ji vê xisleta xwe bernedin, li derdora we kes namîne. Wekî Brachvogel jî gotiye, jiyana hunereke bizemet e. Hinekî li hevalên xwe bifikirin.



**GA (21 Avrêl - 21 Gulan)**

Herkes dizane ku hûn hez ji tenêtiyê dikin, ji ber wê yekê kes têkilî we nabe. Gotina Robert Frost, "Dîwarên zexim, cîranên zexim diafirînin" li gorî we ye. Ji bîr nekin ku hemû însan hewcedarên hev in.



**CĒWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)**

Belkî we gotina David Hume, "Tu tiştî ji xeyalan azadtir tune ye" nebihîstibe, lê dema hûn noqî nava pêlên xeyalan dibin û xwe ji bîr dikin, têkiliyên we yê bi mirovan re qut dibin. Xwe ji erebeyan biparêzin.



**KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tirmeh)**

Hevalên we ji bo ku we biguherînin gelek xebat kirin. We bi neguherîna xwe hemû hewldanên wan di avê de birin. Mirovên ku wekî xwe bimînin nikarin li dû jiyana bimeşin. Ji bîr nekin ku mirov bi kêmasiyan tijî ne.



**ŞÊN (24 Tirmeh - 23 Gelawêj)**

Her çiqas hûn ji şîretkariyê hez dikin jî, hûn baweriya xwe bi tu kesî naynin, heke hûn gotina Tolstoy bi bîr bin wê pir baş bibe: "Bawerî hêza jiyana ye." Serê xwe ji keviran biparêzin ji bo ku eşa serê we zêde nebe.



**SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)**

Hûn her gava xwe bipîvan diavêjin. Rast e, felsefe şik e, lê mixabin hûn ne mirovên filozof in. Montaigne ev gotin ji bo kesên wekî we negotiye, eger hûn dixwazin bi ser bikevin hinekî bêşik dest biavêjin karên xwe.



**MÊZIN (24 Rezber - 23 Kewçêr)**

Li derdora xwe hûn wekî miroveke/î jîr û bîaqil tînin nasîn, lê çî hef e ku baweriya we kêr û qels e. Heke gotina William Adams rast be, zanîna we ne zehf e. Ji ber ku ew dibêje: "Bawerî dewama hişê mirov e."



**DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)**

Dilê we xerab e û hûn qet bi ber mirovan nakevin. Lê wekî Sphokles gotî, xerabî wekî mar e, bi xwediyê/a xwe vedide. Xwe hîni efûkirinê bikin, nexwe bela li dor we digere, bi ihtimaleke giran xelasiya we jê tune.



**KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)**

Hûn qet hez ji durûtiyê nakin, ev jî dide zanîn ku ji we siyasetzan demayê, ji ber vê yekê ji xwe re pirtûkên çand û hunerê bikin. Siyaset li ber çavên we karekî bişewl e, lê her wekî Cervantes jî gotiye, her tiştê ku dibiriqe ne zêr e.



**KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)**

Çavên we tim li ser xelkê ye, lê hûn bi awayekî baş li mirovan nanêrin, mirov ji nezera we ditirsin. Hin caran hûn dixwazin xwe wekî mirovên spehî nîşan bidin jî, mirûzê we rê nade. Tê gotin ku mirûzê mirov eynika dil e.



**DEWLİK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)**

Xisleta we ya herî girîng dîtina pêşerojê ye. Ji ber vê taybetiya we giramgiriya dost û hevalan li hemberî we zehf e. Divê hûn hinekî li ser dîrokê bisekinin. Li gorî John Sherman Pêxemberê pêşerojê yê herî baş paşerojê.



**MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)**

Hûn di karûbarên xwe de qet lez nakin, ev xisletî dihêle ku karên we têkûz bibin, lê hin kar jî hene ku lezgîniyê dixwazin. Ji ber ku firsend du caran li deriyê mirov naxin. Vê gotina Chamfort jî bîra xwe dernexin.



**Haciyê dîn û Gayinî**

Li hêla Botan ji eşîra Didêra kesek bi navê Haciyê Dîn hebû. Haciyê dîn carinan baş dibû, carinan xerab dibû.

Rojekê Haciyê gewr dîsa cinê wî tîne û bi çiya dikeve. Piştî çend mehan hişê Hacî tê serê wî. Lê Hacî li serê çiya û çip tazî ye. Li nêzîkî çiya gundekî bi navê Gayina heye.

Jinên gund hemû çûne ber avê û beravê dikin. Cilê xwe jî ji bo ku zûwa bibin avêtine ser dar û

beran. Haciyê me diçe ku ji xwe re ji wan, cilekî bixwaze da ku bikaribe here mala xwe.

Hacî hêdî hêdî nêzîkî nav cilan dibe ku cilekî li xwe bike. Heyv dibîne ku singê wî û yê jinekê li hev ketin. Jinik gava Hacî dibîne qîr dike û hewarê dixwaze. Hewar bi gund dikeve û gundî mêr, ciwan û zarok tînin hewariyê. Tu mecala Hacî namîne û Haciyê me yê gewr berê xwe dide çiyê. Li pişt xwe

dinêre ku wê bigihîjîne. Qîr dike û dibêje: "Hima neyên, neyên, kar qediya! Qediya!" Gayinî piştî qîra Hacî disekin û dibêjin ku ew wî bikujin jî fêde nake. Dizivirin diçin gund.

Artêşa tirk dikeve Başûr û dertê. Bila here, wê her were. Îş qediyaye û feyde nake. Êdî nikare tu tiştî biser bixe. Aqilê wan hebe wê herin gundê xwe.

ÎBRAHÎM SARAÇ  
CEYHAN

**Kurdê bi tirkî dizanibû**

Mirovekî gundî hebû, pir dixwest ku hîni tirkî bibe. Rojekê leşkeriya wî tî û pir kefxweş dibe. Ji ber ku wê li leşkeriyê hîni tirkî bibe. Ji jîna xwe re dibêje:

"Ezê herim ku ez hatim ezê wekî yekî tirk ji we re bi tirkî bipeyivim."

Zilam leşkeriya xwe diqêdîne û dizivire tî mala xwe û "teq, teq" li derî dixê.

Jinik: "Ew kî ye?"

Zilam: "Bendir, mêrê sendir, ji leşkeriyê gelmiştir" dibêje.

Jinik derî vedike û diçin hundir rûdinin.

Jinik dipirse: "Ê tu hîni tirkî bûyî?"

Zilam: "Erê."

- Ka navê filê bi tirkî bibêje!

- Ê, jinikê navê wisa pir mezin ji me re negotin.

- Ka navê spiyê bibêje.

- Ê, jinikê, yê wisa piçûk jî negotin.

- Naxwe ka navê bizinê çî ye?

- Wele ji miyê re tiştê digotin lê navê bizinê nayê bîra min.

SERWEXT/ÊLIH



**Boq bidin qumandar**

Serbazek û leşkerên xwe diçin gundekî. Ji muxtarê Sgund re dibêjin: "Em birçî ne." Li ser vê yekê muxtar xwarinê dide çekirin. Sifre hazir dibe, muxtar bang li kurê xwe dike:

Oxlim qumandara boq getir. (Kurê min ka ji qumandêr re boqên pîvazê bîne).

Qumandar hêrs dibe, çend gotinan ji muxtar re dibêje û leşkerê xwe dide hev û dimeşe. Muxtar şaş dimîne, fêma nake ka serbaz ji bo çî hêrs bûye. Rûdinin, ew û zarokên xwe xwarinê dixwin.

(ji nêreka pivazterê 'pivaza şîn' re boq jî te gotin).  
M. BEDRAN BÊNAV

**Xulamê jîr**

Rojekê Mîr û xulamê xwe tenê li qesrê rûniştine. Mîr dibêje: "Elo, çî xweş e yek parî?" Elo dibêje: "Mîrê min hêka kelandî." Piştî wê rojê Mîr tu tiştî ji Elo naxwest. Heta sala wî diqulibe. Eynî wê rojê dîsa Mîr ji Elo dipirse, dibêje: "Bi çî?!" Elo bimitale dibêje: "Mîrê min bi xwê."

MISTEFAYÊ CIZÎRÎ

Nêrîna tirkekê li ser ziman û televizyona kurdî

## "Çözüm-ül Askeriye"

Nivîskar Gülay Gökçürk, di rojnameya **Yeni Yüzyılê** hejmarê bi mêjûya 15.5.1995'an de, di quncikê xwe de nivîsek li ser rewşa zimanê kurdî û ronakbîrên kurdan weşand. Bi mebesta, ka em kurd di neynika biyanan de çawan xuya dibin, me ev nivîs ji eslê wê wergerand. Em bawer dikin ku wê nivîsa nivîskara tirk bala we bikişîne.

Hevalekî min ê ku hê nû ji Fransayê hatiye vedibêje:

"Li derdora 20'ê avrêlê (nîsanê) bû. Ez li ber ekrana Med-TV'yê ku bi kurdî weşanê dike rûniştim, da ku ez li civîna çapemeniyê ya hikûmeta li derve ku li derve hatibû avakirin, temaşê bikim. Axaftin bi kurdî ne. Wergêrek ji wergêrê fîngilîzî. Min nihêrt ku ez li wergêrê fîngilîzî guhdarî nakim. Di gel ku ez peyvekê bi kurdî nizanim jî, ez hemû axaftinan tam fêhm dikim. Lewre, di rastiyê de, bi kurdî napeyivin. Tu dibêji qey çend peyvên kurdî tevî yê tirkî erebî, farisî kirîne û zimanekî ecayîb ku pir dişibe tirkî çêkirine. Mesela ji dêla çareya leşkerî, "çözüm-ül askeriye" dibêjin....."

Hevalê min bi rewşeke metelbûyî (heyirî) didomîne: "Piştî civîna çapemeniyê, forumeke ku dişibe "Siyaset Meydanî" ya me çêkirin. Weşana zindî (neqlen) bû. Piraniya axivkar û temaşvanên li studyoyê kurd bûn. Lê hin tirk jî wekî axivkar beşdar bûbûn. Hê di serê axaftinê de gotin, "Em nikarin li ser van meseleyan tev bi kurdî biaxivin. Kes fêhm nake. Ji ber vê yekê emê bernameyê (programê) bi tirkî çêkin." Nûnerên Berzanî û Telebanî jî ber vê qerarê hêrs bûn. Gotin, "Tiştêkî wiha nabe, ji nivî bêhtir kurd li bakurê Iraqê dijîn. Ev operasyon jî li wir diqewime û em li ser vê diaxivin. Hûn çawan dixwazin bi tirkî li serê biaxivin?" Lê derdê xwe bi kesî nedan fêmkirin. Di dawiyê de

hemû axaftin bi tirkî hatin kirin. Ocalan jî gava bi telefonê beşdarî weşana zindî bû, bi tirkî axivî."

Gava min li vê anekdotê guhdarî kir, di serî de ez şermîn bûm. Ez bi xwe hesiyam ku ez li hemberî wê tabloyê çiqas bêzar bûm.

Eger îro kurd, di televizyonê de ku bi mebesta weşana bi kurdî bikin ava kirine, ji bo ku derdên xwe bibêjin bi tirkî bipeyivin, me ew xistibin rewşeke welê ku nikaribin xwe bi zimanê zikmakî ifade bikin, ev rewşeke sotiner e, sêceki dîrokî ye û divê mirov jê şermezar bibe.

Ji aliyê din ve ev tablo rastiyekê diyar dike. Li hemberî wê rastiyê xwe melisandin û biberketin tiştêk e, dîtina wê rastiyê û nixandina wê jî tiştêkî din e.

Heqîqet ev e, zimanê ku bi dehsal û bi dehsalan hatiye qedexekirin, hatiye ber mirinê. Ziman, dema bêne bikaranîn dikarin bijîn. Bi jiyane re dewlemend dibin û diguherin. Ji bo ku hemberiya peyveke nû ya ku dikeve nava jiyana me di zimên de çêbe, divê ku bi wî zimanî bê axaftin, bi wî zimanî bê fikirîn, bi wî zimanî berhemên nivîskî bîn dayîn.

Pêkutî û qedexetiya bi salan, kiriye ku kurdî îro ji bilî axaftina rojane bi kêrî tiştêkî neyê, ketiye rewşeke wisa ku êdî nikare hewcedariyên kurdêkî ku bixwaze di sedsala 21'an de bijî temîn bike. Îro rewşenbîrekî kurdî nikare bi wî zimanî diplomasiyê bike. Nikare bi wî zimanî gelsên aboriya bazarê (piyaseya serbest) deyne holê. Nikare bi wî zimanî gelsên li ser endezyariya (muhindisiya) genetîkê, muneqaşeyên sincî (etik) yê li ser neqilkirina organan, erezyonê, qulbûna Ozonê guftûgo bike.

Esas dibe ku, haya rêvebirên me jê nîn be lê, piraniya kurdan wê rastiyê jî me tevan çêtir dizanin. Ji ber ku dizanin, beriya kurdî fîngilîzî hînfî zarokên xwe dikin. Tê bîra me ku çawan çend

## Çözüm-ül askeriye

Fransayê yekemîn yekemîn arastîyê. "Nîsanê 20'ê avrêlê, Kürteyê sîyanî yekemîn MED-TV'ye, yekemîn yekemîn Sûrîyê Hükümetî'nin bîsan toplanîsîni izlemek üzere ekranın karşısına oturdum. Konuşmalar Kürteyê. Bir çevirmen de İngilizce'ye aktarıyor. Bakrim ki ben İngilizce çevirmiyi dinlemiyordum. Ve tok kelime Kürteyê bilmediğim halde, bütün konuşmaları tam olarak anlıyordum. Çünkü aslında Kürteyê konuşuyorlardı. Türkiye'yi, Arapça'yı, Fransız'yı belki birkaç Kürteyê kelime ile karıştırıp Türkiye'ye çok benzer görüp bir dil oluşturmuşlardı. Mesela, askeriye çözümlerine "çözüm-ül askeriye" diyorlardı."



Arastîyê yekemîn yekemîn arastîyê.

sal berê bi hilanina qedexeya li ser zimanê kurdî re filmê Mem û Zîn ku cara pêşîn bi kurdî hate kişandin, çêkerên xwe metel hişt (heyirand), kasetên bi kurdî ku yek li dû yekê derdiketin ew eleqeya ku di hate hêvîkirin nedît, tîrajên kovar û kitêban li biniya tiştê ku di hate hêvîkirin man.

Heke îro li "Başûrêrojhatê Anadolê" gelek kurd pezên xwe difiroşin, bi wan jî xwe re anteneke peykê dikirin û pê televizyona Medê temaşê dikin jî, bi giştî jî eksan re ye.

Li dîjî sansureke neheq zimanê xwe yê maderî (zikmakî) diparêzin. Lê, ji hêla dinê ve ji bo ku bi zimanê xwe biaxivin ve nêzikî hewlên sînor kirina dinyaya xwe jî nabe. Helwesteke fanatîk napejirîne.

Gelo kurdî, dikare ji lipaşmayîna xwe ya ku digihîje sedsalekê xelas bibe? Heke îmkânê jê re bêne temîn kirin dikare veje û ji mîraseke me ya çandî ya hêmaneke ostantîk bifilite?


Bersiva van pirsan bi tenê dikare di demeke dirêj de diyar bibe. Tiştê ku dikeve ser milên me niha ev e; beriya em li ser vê mijarê bibin xwediyê daraziyekê divê em axa ve dara ku li ber hişkîbûnê ye amade bikin da ku şax li xwe bide û hêşîn bibe. Ê din jî kurd û dîrok dizane.

\*Ev sernava eslê nivîsê ye û tê wê maneyê: Çareya leşkerî. Lê di vir de peyva "çözüm" bi tirkî û veqetandeka "ül" û peyva "askeriye" bi erebî ye. Bi van terkîbeke erebî hatiye çêkirin.

WERGER:  
ZANA FARQÎNÎ

# Meha bîranîna şehîdan

Piştî 12 îlonê zilma dewleta KT'e êdî gihîştibû radeya tevkujiyê. Dixwestin ku hemû girtî bibin îtirafkar û xayîn. Li hemberî wê rewşê Mazlum agirê berxwedanê vêxist, piştî wî jî çar lehengan; Ferhat Kurtay, Necmi Önen, Eşref Anyık û Mehmet Zengin xwe bi agirê berxwedanê şewitandin.



Ferhat Kurtay



Necmi Önen



Eşref Anyık



Mahmut Zengin

Meha gulanê meha têkoşîna gelê cihanê ye. Lê zêdetir li Kurdistanê wisa ye. Doza Kurdistanê azad û bi serbixwe di dîroka kurdan de bûye sedema gelek şehîdbûnan, hejmarê wan bi hezaran e. Di navbera van şehîdan de yê ne kurd jî hene. Lê çî kurd, çî tirk an jî ereb, taybetiyan van şehîdan a hevpar têkoşîna ji mirovahiyeke azad bû. Ew mirovên bijarte bûn. Di nav şehîdên meha gulanê de İbrahîm Kaypakkaya û Hakî Karer pir navdar in.

Hakî Karer rizgariya gelê kurd ji xwe re armanç qebûl kiribû û ji bo vê armanca xwe şehîd ket. Hakî, di sala 1977'an di roja 18'ê gulanê de li bajarê Entabê hate kuştin. Ev endamekî PKK'ê û yê komîteya navendî bû.

Di sala 1979'an dîsa di vê rojê de Halil Çavgun jî şehîd ketibû. Keda ku wan mirovan di ber serfiraziya Kurdistanê de rijandin îro fekiyên xwe dide.

İbrahîm Kaypakkaya jî ji ber tewra xwe ya li

hemberî îşkenceyê baş tê nasîn. İbrahîm ku di 18'ê gulana 1973'yan de li Dersimê kete destê dijmin, îşkenceyê di cih de dest pê kir. Ew birîndar û xwasî, di nav berfê re ji çiya heta bajêr anîn. Di îşkenceyaneya Amedê de tewra wî zalal bû. Wî di digot: "Li gorî me sira xwe dayîn ne mimkûn e. Ji ber vê yekê em komunist gerek e ku serî bidin, feqet sira xwe nedin dijmin." Berxwedana İbrahîm jî hemû şoreşgeran re bû mînak.

Sal derbas bûn, lê ne hovîti, ne jî berxwedan û şehîd kêmbûn. Em dikarin bibêjin ku her ku diçe ev her du tişt jî zêde dibin. Di sala 1982'yan 18'ê gulanê de dîsa li Zîndana Amedê liberx-

wedan hebû. Piştî 12'yê îlonê Girtîgeha Amedê bûbû laboratûwara hovîtiyê. Zilma dewleta KT'e êdî gihîştibû radeya tevkujiyê. Dixwestin ku hemû girtî bibin îtirafkar û xayîn. Li hemberî wê rewşê Mazlum agirê berxwedanê vêxist, piştî wî jî çar lehengan; Ferhat Kurtay, Necmi Önen, Eşref Anyık û Mehmet Zengin xwe bi agirê berxwedanê şewitandin. Livbaziya wan jî qasî doza wan mezin bû.

Wan bi destê hev girtin, boyax û tîner di ser xwe de kirin, piştî re jî agir bi xwe xistin. Sloganên wan dîwarên zîndanê qelaştin, wan digot: "Êgir venemirînin, gur bikin!"

ESNAS MAYA



İbrahim Kaypakkaya



Haki Karer

Rewşenbîrê kurd Ahmet Zekî Okçuoğlu li ser PKK'ê û siyaseta kurdan ji

# PKK TEQÎNA HÊRSA KURDAN A SED Û PÊ

**Lazim e millet jî wek mirovan baweriya xwe bi xwe bînin. Çawa ku bi aqilê xelkê karçêkirin ne rast be, ji bo dewletan jî bi aqil û baweriya ku dewletên din bidin, siyaseta ne rast e û jixwe nameşe jî. Di têkiliyên navneteweyî de dostbûn ne esas e, esas 'feyde' ye. Ji ber ku peyva 'feydeyê' antîpatîk e, ew bi peyva 'dostbûnê' tê nixumandin (maskekirin). Ji bo vê yekê ez biisrar dibêjim ku divêt kurd jî wek her milletî di têkiliyên xwe û Rojava de li gorî esasên 'feydeyê' siyaseta bikin.**

**D**er barê siyaseta ku kurd dikin de, hûn çî difikirin? Bi gotineke din kurd çawa siyaseta dikin? Bi vê pirsê ve girêdayî der barê dîplomasiya ku kurd dikin de, fikrên we çî ne?

Der barê siyaseta ku kurd dikin de, mirov vê gavê nikare tiştêkî musbet bibêje. Sebeba vê jî ji ber rewşa ku kurd di nav de ne. Rewşa kurdan jî gelên bindest yê din cihêtir e. Hebûna wan nayê qebûlkirin. Miletêkî ku hejmarê wî bi deh milyonan dîkare bê îfadekirin, wek ku tune tê qebûlkirin. Bi gotineke din kurd, ne xwediyê 'mafê hebûna xwe' ne. Ev mafê ku yek jî esasê mirovahiyê ye, li kurdan hatiye qedexekirin.

Kurd bi vê zihniyeta neqebûlkirinê ewqas hatine dorpêçkirin ku, heke her tiştî bidin ber çavê xwe û li hemberî vê zihniyetê derkevin jî, dîsa jî xwe bi temamî nikarin ji texrîbatên wê xelas bikin. Ev tiştêkî wiha ye ku wek hinekan hewa, bi gazê jahr kiribe. Mirov jî mecbûr in vê hewayê bidin û bistînin, ji mecbûrî û bêyî îradeya xwe jahrbûyî jî dibin û mirov wê jahrê dikşînin hundirê xwe. Bi awayekî trajîk ev mesele li ser dinya insanê kurd a fikriyatê tesîra xwe rê dide.

Gava mirov çiqas bibe 'xwe' wê ew çend jî bibe xwediyê fikrên afdî xwe.

Sebebên vê rewşa gelê kurd, jî xeynî sebebên ku dijminên wî derxistine holê, gelek jê jî wê tînin...Sebeba ku kurd di siyaseta de her gav zirarê li xwe dikin, ji ber lipaşmayîna wan a çandî û ji ber tarîhên wan ên îdeolojîk e. Ev jî nahêle ku kurd karibin polîtîkaya 'reel' bikin. Halbûkî kurd xwediyê gelek tecrûbeyên trajîk in, lê çî heyf ku kurd dikin nakin jî wî halî xelas nabin.

**Dîplomasi hêla siyaseta ya navneteweyî ye**  
Kêmasiyên ku di faaliyetên kurdan ên siyasî de derdikevin holê bi pi-

ranî di warê dîplomasiyê de ne. Heta îro jî ji ber van qelsiyên gelek zirarê dîtine. Lê kurd dikarin bi zanebûn, ji vê rewşê xwe xelas bikin; ji ber ku êdî tu tiştê wan ê fedakirinê nemaye.

Ê ku îro mohra xwe li hereketa kurdî ya neteweyî (mîlî) xistiye, PKK ye û îro em dibînin PKK tercîhên xwe yê îdeolojîk yê ku nerast bûn, diguherîne; hêdî hêdî dikeve nava dinyaya modern û hin gavan ber bi wê davêje, ev pêşveçûna jî kêfa mirov tîne. Ji van gavavêtinên musbet encam hate bidesistin jî. Gelek deriyên dîplomasiyê yê ku hatibûn gir-

vîn yek jî milletê herî qelebalix in. Li herêmê jî bo avakirina ewlehî û îstîqrarê, dikarin rola 'tayînkirinê' bidin ser xwe. Lazim e ji fikrên bêoxir (bêyom) ên 'maoîst'-'fîkrên dinyaya sêyemîn'-'bidûr kevin. Ji ber ku 'maoîstî' bataxî ye. Heta vê gavê van fikran kesekî re kar nekiriye. Em bihêlin, bila dijminên me van fikran biparêzin. Esil talûkeya mezin, dûrbûna ji rojava ye. Tam di vir de ew senayoyên bêoxir yê oryantalîzmê dest pê dikin.

Heta vê gavê tu kesî jî pevçûna bi rojavayê tu feyde nedîtîye. Di esasê

hereketên îslamî jî bisekinin.

Ji bo ku kurd xwe ji Îsraîlê bêtir nêzîkî rojavayê bikin, gelek sebebên dîrokî û siyasî mewcûd in.

Nifteya (kilîd) ku deriyên Rojava ji kurdan re veke, niha di destê PKK'ê de ye. Du sal berê min di nivîseke xwe de gotibû ku divêt PKK, di navbera kurdan û rojavayînan de nebe problem (PKK'in sorun oluşturmaması) jî bo vê yekê divê; an ew xwe biguherîne û liberîze bike û an jî rê li ber partîyeke veke ku di vê çarçoveyê de karibe cewabê bide têkiliyên bi Rojava re. Min

vê qebûl nakin an tînin qetilkirin an jî îşkenceyê bi wan dike û wan davêje hepsan. Ronakbîr û hereketên kurdan yê siyasî, ji bo ku mesele bi awayên siyasî bê çareserkirin, her gav bangî rêveberiya tirk kirine. KT, li hemberî vê banga aştiyê ya masûm, bi şidetê bersiv da. Em dev ji dewrên kevin berdin, ez bi xwe rastî sê derbeyên leşkerî bûm; bi dehhezaran ronakbîr û insanên kurd ên ji rêzê ku kêrîkek jî nexistibûn destê xwe, ji ber ku li pey mafên xwe digeriyan hatin îşkencekirin û bi salan di hepsan de riziyan.

KT'ê, heta vê gavê sê sal ji azadiya (emrê) min xesb kir. Ji bo ku ez wek hiqûqzan û aşîxwazekî li pey doza mafên kurdan geriyam û min gelek tişt talib kir, ez ji azadiyê mehrûm kirim. Hê jî ez nizanîm wê çiqasî din bidizin.

## PKK, teqîna hêrsa kurdan e

PKK teqîna hêrsa kurdan ku ev sed û pênc sal e heysiyeta wan ji aliyê rêveberiya tirk ve tînin bînpêkirin. Heta ev siyaseta reveberiya tirk bidome, wê PKK jî hebe.

Çi li hundir û çî jî li derve, baweriyek hebû ku PKK encama bûyereke wextî ya şertên şer e. Ev bawerî hêdî hêdî tê guherandin, ji ber ku PKK'ê, gelek gavên ber bi ketina nava sîstemê ve, avêtin. Êdî herkes PKK'ê û KT'ê wekî du terefan dibîne. Heta vê gavê dihat hesabkirin ku bi guherîna KT'ê wê PKK jî sehneyê rabe (derkeve), lê êdî hate dîtin ku ev fikr nerast e.

Fikra hakîm (serdest) terefdarê guherîna herduyan e.

PKK di xweguherînê de ji KT'ê zûtir hereket dike. Di kongreya PKK'ya dawîn de gelek guherînên ber bi çav çêbûn. Li hemberî van guherînan, KT'ê di hêla demokratîkbûnê de tu gav neavêtin.

Heta vê gavê PKK'ê û KT'ê, xwe li ser kêmaniyên hevdu ava û zêde dikirin. Nihayet PKK'ê ji



tin, bi gavaêtinên PKK'ê yê ber bi sîstemê ve, vebûn.

Rojava jî bo avakirina Parlementoyê û TV'ya MED'ê îşareta kesk li ser gavavêtin û guherînên PKK'ê vexistine, yanî tesîra van guherînan ev encam derxistiye holê. Hîn gelek gavên ku lazîm in ji aliyê her du terefan ve bînin avêtin, hene. Şik jê tune ku gava PKK li gorî normên navneteweyî hereket bike, wê gelek deriyên navneteweyî ku heta îro nedihatî vekirin, bînin vekirin.

Van rojan (deman) têkiliyên dewletên Rojhilata Navîn û yê Rojava pir xerab in û wer xuyaye ku heta demeke dirêj wê wiha bidome. Pêwîst e kurd jî vê îstîfada bikin.

Kurd li Rojhilata Na-

xwe de rojavayîbûnê tê maneya medeniyetê. Kesekî nikare li dûrî medeniyetê bisekine. Ji bo vê yekê divê mirov qasî rojavayîyan nêzîkî rojavayê bisekine. Ji van peyvan divê maneya ku rojavayî xeletî û çewtîyan nakin dernekeve û divê bê zanîn ku ew ji bo menfeetên xwe dikarin gelek tiştan jî feda bikin. Li hemberî van tewran, divê mirov bi nêrîna 'sêdinyabûnê' dernekeve û bi terza rojavayîyê derkeve. Di nêzîkbûna kurdan û rojavayîyan de menfeetên herdu hêlan jî hene. Li Rojhilata Navîn milletê kurd tenê arî ye. Di bin fikra şerê îslamê û rojavayê de, pevçûna dîrokî ya çanda Arî û Samî heye. Çawa divê em dûrî fikrên 'dinya sêyemîn' bisekinin, lazîm e em dûrî cereyan û

ev fikr parastibû. Di van demên dawîn de ez bi kêfxweşî dibînim ku PKK, di riya têkiliyên kurdan û rojavayîyan de ji bo bikaribe cewabê bide, xwe diguherîne.

**Dînamîka ku bûye sebeba pêşketina PKK'ê çî ye? Kîjan hêz û qewetê ew her gav bi pêş ve bîriye?**

Li Tirkiyeyê wek her hereketa radîkal, PKK'ê jî hêz û dînamîka derketin û pêşketina xwe ya esas ji siyaseta rêveberiya tirk stand. Komara Tirkiyeyê (KT) her kesê ku mafan dixwaze bi metodên şidetê dieciqîne, ji bilî vê metodê tu şensê nade kesî. Rêveberiya tirk ji tanzîmatê û bi vir ve li hemberî kurdan her diçe bixurtir şidetê bikartîne. Dixwaze wan bi vê riyê aşmûle bike. Kurdên ku



elatê Me peyivî:

# SALAN E

bo xerakirina vê denklema bêoxir, gav avêtin. Êdî PKK, firsetê nade KT'ê ku ew xwe li ser kêmaniyên PKK'ê zêde bike. Ev jî karê KT'ê dixê zorê.

**Kurd dikarin heta ku derê û kîjan wextî baweriya xwe bi Rojava binin?**

- Lazim e mîlet jî wek mirovan baweriya xwe bi xwe binin. Çawa ku bi aqlê xelkê karçêkirin ne rast be, jî bo dewletan jî bi aqil û baweriya ku dewletên din bidin, siyaseta ne rast e û jixwe nameşe jî. Di têkiliyên navneteweyî de dostbûn ne esas e, esas 'feyde' ye. Ji ber ku peyva 'feydeyê' antîpatîk e, ew bi peyva 'dostbûnê' tê nixumandin (maskekirin). Ji bo vê yekê ez bi îsrar dibêjim ku divêt kurd jî wek her mîletî di têkiliyên xwe û Rojava de li gorî esasên 'feydeyê' siyaseta bikin.


Heger firo Rojava li kurdan xwedî derdikeve, jî ber feydeyên xwe vî karî dike. Gava rojavayîyan kurd bi merhemeta faris, tirk û ereban hiştin jî ev niyet hebû.

**Lazim e kurd 'bibin civakeke ji xwe re'**

Siyaseta li gorî berjewendî û feydeyan, ne bi Rojava dest pê kiriye. Ev nêrîn, ji dîroka mirovahiyê ya herî kevn ve tê zanîn. Ji bo vê yekê mirov nikare rojavayîyan jî ber vê siyaseta şûdar bike. Wezîfeya kurdan ew e ku bi rojavayîyan bide fêmkirin ku çareserkirina vê meseleyê li gorî feydeyên wan e jî. Kurdan heta firo ne jî bo xwe lê jî bo xelkê siyaseta kiriye. Rewşa ku firo ew tê de ne jî, jî ber vê yekê ye. Lazim e êdî kurd, 'bibin civakeke ji xwe re'. Şertê ewil ê mîletbûnê jî û yê dewletbûnê jî ev e.

Heger firo licembûna kurdan, li gorî hewcedariya feydeyên rojavayîyan be, lazim e kurd bi vê kêfxweş bibin. Li gorî vê jî divêt kurd hewl bidin ku ev têkilî her berdewam be.

Bê şik mirov dikare bibêje ku têkiliyên bin-



geha wan li ser feydeyan be, baweriyê nadin mirov. Heger kurd dixwazin têkevin nav têkiliyên ku baweriyê bidin wan, divê ew di her warê jiyana de xwe bikin rojavayî (medenî). Bi gotinê din divêt ew medeniyeta modern qebûl bikin û bi lez xwe bi pêş ve bibin.

Yek ji propagandaya dijminên kurdan ew bû ku kurd nikarin yekîtiya xwe çêbikin û her tim bi hev re şer dikin. Kurdan, di vê dewrê de tam zemanê nerastiya vê qeneta bidesxistibûn, lê Berzanî û Telebanî sax bin, ev qoz û baweriyê careke din dan destê dijminên kurdan.

**Ronakbîrî çî ye? Di vê çarçeweyê de rewşa ronakbîrînan kurdan çawa ye? Di nav heriketa siyasî ya kurdan de rola wan çî ye? Çi wezîfe dikeve ser milên wan?**

- Taybetiya ku ronakbîrî jî alim, heta ji entelektuel vediqetîne, tevgerîna wî ye. Ronakbîr,

ne kesê ku bi tenê dibîne û dizane, lê belê mucadeleya tiştê ku dibîne û dizane jî dike. Ji bo vê yekê biweşa ronakbîrîyê bi awayekî spontane 'hîsa mesuliyetê' jî di xwe de dihundirîne. Lê di civakên wekî ya me de ev hîs pir peyda nabe, jî bo vê yekê jî yên ku ne xwediyê vê sîfatê ne, wek ronakbîrên binavkirin; di vê çarçeweyê de em xwe mesûl dibînin ku ferqê têxin nav van kes û ronakbîrên rastî.

Wek her civaka bişûndemayî, rewşa ronakbîrînan tirk û kurdan jî ne ew çend baş e. Heger li vî welaatî ronakbîrînan rastî tîrî xwe hebûna, rêveberiya tirk nikaribû li ser tirk û kurdan ewçend zilmê bike û cesaret nedikir ku herdu gelan bi hev bide qirkirin.

Piraniya ronakbîrînan tirk xulamtiya nijadperestiya tirk dikin. Ji bo qetlîamên rêveberiya faşîst ku li hemberî kurdan çêdike, li çepikan dixin; yên ku van kiri-

nan teswîb nakin jî, jî tirsan, dengê xwe dernaxin.

**Li ser navê kurdîyê siyaseta û ticarêta dikin**

Rewşa ronakbîrînan kurdan hîn wehîmtir e. Gelek kurdên li gorî 'pîvana dinya sêyemîn' xwe wekî ronakbîr dihesibînin, hene. Ew dikevin xizmeta nijadperestiya tirkan û bi awayekî vekirî destekê didin qetlîama kurdan. Ev kesên ku jî xwe re dibêjin 'em ronakbîrînan kurd in' piraniyan van li ser navê kurdîyê siyaseta dikin, jî aliyekî ve jî ticarêta vî karî dikin. Ji bo wan kurdîyê, jî wasîteya xwestekê wan yên siyasî pê ve tu tiştî îfade nake.

Ev kesana gava li hesabê wan bê, dikarin jî herkesî bêtir xwe kurd nîşan bidin. Gava li hesabê wan neyê jî dikarin wê kurdîyê ku pesna wê didan, têxin bin piyan û tavilê xwe bavêjin deriyê partiyên tirkan. Legalîteya kurdan hew-

## PORTREYA A. ZEKÎ OKÇUOĞLU

Di sala 1949'an de li navçeya Elezîzê Depê (Karakoçan) li gundê Okçiyîyan hat dinê. Dibistana seretayî û ya navendî li Depê, lîse jî li Elezîzê qedand. Di sala 1967'an de kete Unîversîteya Stenbolê Beşa Hiqûqê. Yek ji avakarê Ocaxa Çandê ya Şoreşger a Rojhilat (DDKO) bû. Berî derbeya 12'ê adarê, bi serkêşê Partiya Demokrat a Kurdistanê Tirkîyeyê (T-KDP) Dr. Şivan re têkilî danî. Ji bo demekê li Kurdistanê Başûr ma. Piştî ku vegeriya Tirkîyeyê, jî aliyê mehkemeyê ve ji ber doza DDKO hate darizandin. Nêzî du salan di hepsê de raza. Berî efûya 1974'an jî hepsê hate berdan. Di avakirina Komeleya Çandê ya Şoreşger û Demokratîk (DDKD) de bû alîkar. Di sala 1976'an de DDKD bû duşman û hereketa Kawa derket holê. Okçuoğlu, yek ji serkêşê hereketa Kawayê bû. Piştî demekê ew jî vê hereketa jî veqetîya û bi serê xwe xebata doza kurdî kir. Fakulteya Hiqûqê di sala 1978'an de qedand û pişt re jî dest bi ebûqatiya serbest kir. Piştî salên 90'î, Weşanxaneya Dozê ava kir û bi dehan kîtabên kurdî û yên li ser pirsgerîka kurdan hatibûn nivîsandin, weşand.

qas sal e ku di rûyê van de gavekê bi pêş de neçûye. Mucadeleya kurdan a siyasî di warê legal de cihê ku heq dikir nestand, heta ev kes û niyetên wan li ber vê mucadeleyê bûn asteng. Ew vê yekê bi zanebûnê dikin. Ji ber ku ew dizanin gava asteng li pêş hereketa kurdan a siyasî, jî ber siyaseta vanên rastîyan rabe, cih jî wan re namîne. Tu meziyetên van kesan tunin. Ev kesên ku di jiyana siyasî ya avzêla (batak) tirkan de mezin bûne, ne li gorî çanda siyaseta, lêbelê li gorî entîrkayîyan ku jî siyaseta vanên tirk hîn bûne, siyaseta dikin.

Berpirsiyariya ronakbîrînan kurd, li gorî şertê ku tê de dijîn, pêşî bi xebata li ser zimanê kurdî û çanda wî dest pê dike. Ronakbîrînan kurd jî bo bipêşxistin û bikaranîna zimanê kurdî bi taybetî jî jî bo vî zimanî di nav ronakbîrînan û hereketa siyasî yên kurdan de bike zimanê 'zîkmakî', lazim e

pir bixebite. Ji bo mirov xwe ronakbîrînan kurd bihesibîne, divêt jî bo kurdan siyaseta bike, fikrên nû biafirîne û wek kurdekî bifikirê. Ji bo ku mirov xwe wek kurdekî bihesibîne, divêt berê berê zimanê kurdî baş bizane, wî zimanî karibe bikarîne û ew çanda ku li ser koka vî zimanî şax daye, bi xwe re his bike. Ew kesên ku jî xwe re dibêje: "Ez ronakbîrekî kurd im," wek fantazyekê li zimanê kurdî dinihêre û hejmarê van ne hindik e. Ji ber vê yekê berî herkesî mensûbên sazîyên ku bi kurdî weşanê dikin, layiqî sîfata ronakbîriya kurdan in. Ez bi xwe wiha difikirim. Nîfşê ronakbîrînan kurd yê nû, wê jî cihên werê derkevin. Heger kurd bixwazin hebûna xwe a siyasî berdewam bikin, divêt hejmarê sazîyên wiha zêde bikin.

HEVPEYVÎN:  
SUUT KILIÇ

# Li gorî agahiyên ku ji ajansa Kurd-A gihane me ARGK'ê firokeyeke artêşa tirk daxist

Li Kurdistanê bi hatina demsala havînê, livbaziya gerîla jî zêde dibin. Li gorî agahiyan, vê heftiyê jî gerîlayên ARGK'ê li Başûr, Botan, Dêrsim, Xerzan, Serhed û hwd. livbazî çêkirin. Di van livbaziyan de gelek êrîş, kemîn û kontrola rîyan jî aliyê gerîlayan ve hatin pêkandin. Ji van lihevixistinên yek jî li mintiqeya Cifreta ku li ser navçeya Xanê (navçeyê Amedê) bû û di wî şerî de firokeyeke artêşa tirk jî aliyê gerîlayan ve hate xistin.

9.5.1995

Li Botan, di navbera gerîlayan û cerdevanan de şer derket. Di vî şerî de 2 cerdevan mirin û 3 cerdevan jî birîndar bûn. Piştî vî şerî gerîlayan gelek çek bi dest xistin.

Gerîlayên ARGK'ê li Şîrxê di gelîyê Deriya Şeqo de, komek hêzên dewletê xistin kemînê. Di vê kemînê de 3 leşker

mirin û 5 leşker jî birîndar bûn.

Li Girgê, di newala Mele Kuryan de, hêzên dewletê pêl mayîna gerîlayan kirin, 2 leşker mirin û 5 leşker jî birîndar bûn.

Hêzên dewletê, li Garisan li deşta Perwarî pêl mayînen gerîlayan kirin, 4 leşker mirin û 12 leşker jî birîndar bûn.

Gerîlayan li Girgê di gundê Bestînan de êrîş birin ser cerdevanan, di vê êrîşê de 2 cerdevan mirin.

Li gorî agahiyan gerîlayên ARGK'ê çaviya petrola Behdînan bombe kirin. Der barê detayên êrîşê de agahî bidest neketin.

10.5.1995

Gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê di navbera Amedê û Hênê de şer kirin. Li gorî agahiyan, di vî şerî de 15 leşker û gerîlayek mirin.

Hêzên dewletê di navbera Dêrsimê û Depê



Artêşa tirk li hemberî ARGK'ê û gelê kurd li Kurdistanê gelek helikopteran bi kar tînin.

(Karakoçan) de ketine kemîna gerîlayan. Di vê kemînê de 4 leşker mirin û 2 leşker jî birîndar bûn.

Leşkerên artêşa tirk li Mêrdînê, di navbera rîya Stewr û Mîdyadê de pêl mayîna gerîlayan kirin. Di vê livbaziyê de leşkerêk mir û leşkerek jî birîndar bû.

Gerîlayên ARGK'ê li navçeya Mêrdînê, li Hezêxê êrîş birin ser qereqola Verzîkê. Li gorî agahiyan di vê livbaziyê de 3 leşker mirin. Der heqê birîndaran de tu agahî bi dest neketin.

11.5.1995

Li Çewlikê di warê Yedisu de, di navbera

gerîlayan û hêzên dewletê de şer derket. Di vî şerî de 20 leşker û 2 gerîla mirin.

Gerîlayan li Haftanînê, hêzên dewletê xistin kemînê. Di vê kemînê de 2 leşker mirin û 2 leşker jî birîndar bûn.

Wekî din, dîsa gerîlayan li Haftanînê êrîş birin ser qereqola Kaşûriyê. Di vê êrîşê de 3 leşker mirin.

Cerdevanan, li ser rîya di navbera Girgê û Bêspînan de pêl mayîna gerîlayan kirin. Der heqê mirî û birîndaran de tu agahî bidest neketin.

12.5.1995

Li Haftanînê, li ser Girê Zeviyê di navbera

gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şerêk giran qewimî. Di vî şerî de 15 leşker mirin û nêzîkî 20'an jî birîndar bûn.

Gerîlayan li ser rîya Amedê û Çewlikê komek hêzên dewletê xistin kemînê. Li gorî agahiyan di vê livbaziyê de 4 cemsê îmha bûn û 12 leşker jî mirin.

Di navbera Lîcê û Pîranê de gerîlayan û cerdevanan şer kirin. Di vî şerî de 3 cerdevan û gerîlayek mirin.

Hêzên dewletê li Sêrtê, li deşta Sasonê pêl mayîna gerîlayan kirin, 4 leşker mirin û 3 leşker jî birîndar bûn.

Li Xerzan di warê Çi-

yayê Gaz de hêzên dewletê ketin kemîna gerîlayan. Di vê kemînê de 5 leşker mirin û 3 leşker jî birîndar bûn.

Gerîlayan li Xerzan di navbera Kevirê Qul û Gumika de hêzên dewletê xistin kemînê, di kemînê de 3 leşker mirin û leşkerek jî birîndar bû.

Gerîlayên ARGK'ê li Tûxê, di gundê Sîkaranîsê de êrîş birin ser cerdevanan. Di vê êrîşê de 6 cerdevan mirin. Li gorî agahiyan, piştî vê livbaziyê gerîlayan dest danîne ser 400 pezî.

Li gorî agahiyan li navçeya Dêrsimê li Pêrtêkê gerîlayan êrîş birin ser malên subayan. Di vê livbaziyê de avahiyeke subayan û 4 avahiyeke koperatîfê xesar dîtine.

13.5.1995

Li Haftanînê, li ser Girê Avagûzê di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şer derket. Di şerê de 2 leşker mirin û leşkerek jî birîndar bû.

Li Çewlikê, di warê Yedisu de, di navbera gerîlayan û leşkeran de şer derket, di vî şerî de 8 leşker mirin û 3 leşker jî birîndar bûn.

14.5.1995

Gerîlayên ARGK'ê di navbera Perwariyê û Xirkurmê de komek leşker xistin kemînê. Di vê kemînê de 4 leşker mirin û 3 leşker jî birîndar bûn.

Cemseyeke artêşa tirk, li ser rîya Girgê li mayîna gerîlayan qelibî. Li gorî agahiyan cemse îmha bû, der heqê mirî û birîndaran de tu agahî bi dest neketin.

Kurd-A/Welatê Me

## Li Nisêbîn û Wanê hêrsa gel

Li Kurdistanê roj derbas nabe ku kesek jî aliyê hêzên kontra ve neyê kuştin. Li hemberî neheqiyên hêzên dewletê û peyayên wê sebr û bédengiya gelê kurd bû serhildan. Di demên dawîn rayedarên dewletê û çapemeniya wan dixwestin bidin xuyakirin ku li Kurdistanê her tişt di rewşeke normal de ye. Lê bûyerên Nisêbînê û Wanê, dan xuyakirin ku gel, li hemberî neheqiyên, tu carî bédeng namîne. Bûyera yekemîn li Nisêbînê çêbû.

Di 14'ê gulanê de li Nisêbînê hizbîkontrayan kesek bi navê Seyît Şemso kuştin. Seyît Şemso li der û dora xwe wekî mirovekî welatparêz dihate naskirin. Piştî vê kuştinê, xelqê 2 hizbîkontra kuştin û 2 heb jî birîndar kirin. Piştî êrîşa kontrayan, kesekî din bi navê İzzettin Aktaş di dikana xwe de hate kuştin. Li gorî agahiyan Aktaş, bavê endamekî hizbîkontrayan bû.

Hêzên dewletê di meş û protestoya gel de bi çekan 7 kes birîndarkirin û nêzîkî 10 kes jî

binçav kirin.

Berdevk û çapemeniya tirk, ev bûyer wek pevçûna PKK'ê û Hizbullah nîşan dan û xwestin ku nefreta gel a li hemberî neheqiyên bi awayekî din nîşan bidin.

Li Wanê şerê gel û leşkeran

Li navçeya Wanê li Xawesorê (Gurpînar), di 15'ê gulanê de jî bûyerê çêbû. Di maça fûtbolê de Xortên Xawesorê 2-0 li Hêza Komandoyan dibin. Piştî xelasbûna maçê nêzîkî 50 leşker êrîşî hakem û xelqê dikin. Leşker, ji aliyekî ve bi daran li xelqê dan û ji aliyekî ve jî çêrên wekî, "kûrdên bêşeref, kurê o..." kirin. Xelqê jî piştî vê yekê bersiva leşkeran dan û şerê bi dar û keviran nêzîkî 15 deqîqe dewam kir. Di encama lihevixistinê de du leşker 9 kes birîndar bûn û hêzên dewletê 13 kes xistin binçav. Li gorî agahiyan ku me ji herêmê bi dest xistin, piştî şerê nêzîkî 300 kes bi alên ERNK'ê meşîyan û êrîşa leşkeran protesto kirin.

Navenda Nûçeyan



Heftiya din ceribandînen serhildana gel ên li hemberî neheqiyê, bi darê zorê hatin sekinandin.

### Leşker li gundê cerdevanan jî didin

Li çelêya Culmêrgê leşkeran gundê cerdevananê Bilican dane ber guleyên havanê. Di 9'ê gulanê de jî hêla Qumandariya Alaya Cendermeyên Çelê ve gundê Bilican bi havanê hate gulebarankirin. Di gulebaranê de 20 gule li nava gund ketin 5 xaniyan dît û gelek jî zerara madî çêbû.

Di encama bûyerê de mirî û birîndar çenêbûn. Li ser bûyerê mixdarê gund û sercerdevanan Omer Kalayci got: "Ji Alayê jî mere gotin PKK'ê gundê we gulebaran kir. Lê, li Çelê her kesî dît ku top ji Alayê hatin avêtin. Em cerdevan in êrîşî me jî dikin."

Kurd-A

Rexneyek li alfabe ya C. Berixan û qelsiya alternatîfên din (2)

# Alfabeyeke me ya t ê k û z h ê ç ê n e b û y e

Dema mirov zimane-ki hîn bibe, mirov mecbûr e ku, alfabe û rêzimanê wî zimanî hîn bibe. Erê, neteweya kurd neteweyeke ewqas bêhiş e ku, ji bo ku zimanê xwe hîn bibe, xwe mecbûr dibîne ku alfabe ya xwe nêzikî alfabe ya neteweyeke din bike? Divê rewşên birên me yên dixwazin alfabe ya kurdî nêzikî ya tirkî bikin û yên ku alfabe ya Bedirxaniyan weki nivîseke pîroz dibînin bersiva vê pîrsê bidin. Min ev pîrsa ji xwe jî pîrsî. Ji ber ku heta niha min jî, li ser navê hêsankirinê tim dixwest ku pevdengên kurdî bi piraniya pevdengên zimanên ewrûpî re eynî bin. Lê vê riya ji zanîne dîr tim berê min digirt û min çare nedidît ji bo ku kurdî li ser alfabe ya t ê k û z bixebitîm. Ez karim bi hêsana bibêjim ku heta niha ez li gorî dengzanîna kurdî nedixebitîm. Ev alfabe ya ku ez bi vê nivîsê pêşniyaz dikim bi temamî li gorî nîsbeta bikaranîna dengên kurdî û pîvanên din ên alfabe ya t ê k û z hatîye çêkirin.

**Alfabe ya niha bersivê nade hewcedariyan**  
Alfabe ya kurdî ya bi tîpên latînî ne tenê ji aliyekî ve, ji pir aliyên ve bersivê nade hewcedariyên kurdî. Ji ber ku ev alfabe ya bi awayekî kolektîf nehatiye çêkirin ji roja ku hatiye diyarkirin bi vir de, xwe tu demê ji rexneyên cur bi cur xelas nekiriye. Di ronahiya zimanzaniya pêşveçûyî de pîvana alfabe ya t ê k û z çî ye? Heta em vê pîrsê bi riya zanîne nebersivînin, ne mimkûn e, em karibin dawiyê li van guftûgoyên li ser alfabe ya t ê k û z bînin.

**Alfabe ya Celadet bigelemşe ye**  
Alfabe ya Celadet Bedirxan ji aliyê pratîkî ve pir bigelemşe ye. Piraniya rewşên birên kurdî ên bi tirkî hînî xwendin û nivîsandinê bûne ji ber tîpên bibilindek (ê, î, û) vê alfabe ya pratîk nabînin. Dîroknûs Cemil Gündoğan di nivîseke xwe ya li ser alfabe ya kurdî ya ku di rojnameya Özgür Gündemê de hatiye weşandin de tîpên bi-

bilindek (he, î, û) li ber zû nivîsandinê weki astengeke girîng dinirxîne, di dewsa wan tîpan de bikaranîna tîpên taybetiyên alfabe ya tirkî pêşniyaz dike. Rojnameya Azadî, Kovara Deng, Govend û hinek weşanxaneyên kurdî di nivîsên xwe yên bi kurdî de bi temamî nebe jî, ji zû ve vê pêşniyazê di pratîkê de bi kar tînin. Dr. Celadet Çeliker jî, di nivîsên xwe de alfabe ya t ê k û z weki rojnameya Azadî bi kar tîne. Rojnameya mehane Dengê Kurd, ku li Azerbeycanê derdikeve bi nivîsên xwe yên bi alfabe ya kurdî ya latînî alfabe-

bûyî ye. **Pirsgirêka klavyeyê û tîpa 'Ş'**  
İsmet Şerîf Wanlî di nivîseke xwe ya li ser alfabe ya t ê k û z ku di hejmarê 1. a Zendê de hatiye weşandin dewiha dibêje: "Ez bi tîpnivîsa xwe ya elektrônîk karim fransîzî û almanî binivîsim, lê bes ne bi kurdî." Sedema vê ya herî girîng di alfabe ya ewrûpî de nebûna tîpa taybetiya alfabe ya tirkî 'Ş' ye. Di vê nivîsa xwe de I. Cherif Vanly alfabe ya t ê k û z ji 26 tîpên standard ên alfabe ya latînî pêk tê, pêşniyaz dike. Ji xeynî tîpa 'Ş' hemû tîpên taybetiyên alfabe ya fran-

mîk û bi niçik hatiye çêkirin. Zanistî nîn e. Heke ji bo kurdî, 26 tîpên tîr nekin mirov kare hinek tîpên taybetî jî bi kar bîne. Dema em li gorî nîsbeta bikaranîna dengên bingehî ên kurdî li pîrs-girêkê dinihêrin, bi awayekî eşkere tê xuyakirin ku 26 tîpên tîrê kurdî dikin.

**Pevdengên kurdî**  
Di hêsana bûna xwendin û nivîsandina zimane-ki de fonetîkbûna alfabe ya t ê k û z digêre. Kurdên bi tirkî hînî xwendin û nivîsandinê bûne di alfabe ya t ê k û z weki ya tirkî de îsrar dikin. Ji



**Kovara Zend di rûpelên xwe de giranî da guftûgoyên li ser alfabe ya t ê k û z kurdî lê heta niha jî encameke berbiçav ji van guftûgoyan derneketiye.**

ya Bedirxaniyan serûbinî dîke.

**Tesîra alfabe ya t ê k û z**  
Di bikaranîna alfabe ya latînî ya kurdî de her nivîskarekî vê rojnameyê ev tîpên bi bilindek li gorî xwestina dilê xwe bi kar anîne. Piraniya nivîskarên alfabe ya Celadet Bedirxan diparêzin jî, ji bo hinek tîpên bi kumîk dijberiya xwe ya li hemberî vê alfabe ya t ê k û z weki eşkere tînin zimên. Rewşên birên û nivîskarên me yên dixwazin bi zêdetir nêzikî hev kirina alfabe ya kurdî û tirkî me ji îşkenceyekê xelas bikin, bi nezanî be jî, encama xwestina wan me dike bin îşkenceyekê xedartir. Mirov bixwaze nexwaze ev pîrs tînin bîrê: Gelo ev rewşên birên û nivîskar rewşa kurdî ku li derî bakurê welatê me dijî çiqas fikirîne? Gelo çiqas mafê wan heye kurdî başûr ên rojhilat, ên başûrê rojava û ên li welatên cur bi cur ên dinyayê dijî mecbûrî bikaranîna klavyeya ku bi taybetî ji bo tirkî hatiye çêkirin, bikin? Divê kes vî mafî bi xwe re nebîne. Ji xwe ev maf jî nîn e, berhemeke bişavtina hov a di rihê kurdan de bich-

sizî (ç, ê, î, û) jî derdikeve?" Ji ber ku ji bo mirovên li derî welatên bi fransîzî diaxivin dijî, nivîsandina van tîpan bi qasî li Swîsrê nivîsandina 'Ş' ya tirkî dijwar e. Lê bi 26 tîpên standard ên alfabe ya îngilîzî, li hemû welatên di nivîsandina zimanên xwe de alfabe ya latînî bi kar tînin û heta li welatên ku alfabe ya t ê k û z neteweyî yên cur bi cur bi kar tînin jî, ji ber navnetewîtiya zimanê îngilîzî nivîsandin pir hêsan e. Di pêşniyaza xwe de İsmet Şerîf Wanlî jî, di bin tesîra zimanên ewrûpî de maye, bi hişekî azad li gorî dengzanîna kurdî û nîsbeta bikaranîna dengên alfabe ya t ê k û z pêşniyaz nake. Weki Baran Rîzgar di nivîseke xwe ya di rojname Welat û kovara Zend de hatiye weşandin de, dibêje: "Ev awa tenê rûpelên kitêban zêde nake, ji ber bê qeyîdebûnê xwendin û nivîsandina kurdî diwartir dike. Alfabe ya t ê k û z fonetîkbûnê zêde dîr dixê, cihê bikaranîna pevdengên ku pêşniyaz dike ne kifş e." Bi kurtî mirov kare bibêje ku alfabe ya t ê k û z pêşniyaz dike, li ser bingeha xelasbûna ji tîpên bi ku-

bo vê armanca xwe mafdar derxînin jî tim xwe dispêrin fonetîkbûna alfabe ya tirkî. Ji bikaranîna pevdengan pir ditirsin. Ji ber ku bi tirkî pevdeng tune ne, dibêjin: "Heke em pevdengan bi kar bînin mirovên me yên ku bi tirkî hînî xwendin û nivîsandinê bûne, ew dê nikaribin zimanê xwe hîn bibin." Zêdetir jî rewşên birên me yên hîna li dinê bi çavên tirkî dinihêrin û bi hişê tirkî difikirin, vê îdiayê tim derdixînin pêş. Baş tî zanî ku îngilîzêk di demê kintir de hînî xwendin û nivîsandina îngilîzî dibe, ji ber ku zimanî wî yê maderî ye. Nexwe mirovêkî kurdî heke bêhiş nebe, çima nikaribe zimanê xwe yê maderî weki zimane-ki xwedî alfabe ya t ê k û z zimanê din cuda, hîn bibe? Ji xwe pevdeng dema ku dengêkî bide li ber fonetîkbûnê jî asteng nîn e. Piraniya rewşên birên me yên bakurî bi peyvên kurdî tirkî dinivîsin. Ji ber vê yekê bi dev çî dibêjin bila bibêjin nikarin zimanê xwe yê nivîskî bi temamî ji tirkî cuda bifikirin.

**ROJHAT AZADÎ**  
Dûmahûk heye

## DEFTER

### Temaşeya TV'ya MED'ê û hêstirên çavan

Mîna her rojê, dîsa Msamet li 7'ê êvarê, min bi dilekî geş destê xwe avête pişkoka TV'yê û pêl kir. Çawa ji pişt çiya roj hilat û şewq û şemala wê avête derdor û dû re avête derdor û dû re avête derdor kes û sor û zer. Nivîsa "MED-TV" ê li ber çavan raxist. Ku baskên min çêbûna ezê bifiriyama. Wê hengê ji şahiya dil, serê min zivîrî. Ji lew re êdî em jî xwedî TV'yeke neteweyî ne. Bi saya wê ev çanda me ya geş û dewlemend wê deng bide çar aliyên cîhanê.

Wekî tî zanî TV'ya MED'ê hê bernamêyên Sîhêtiyê (testê) diweşîne. Lê şeva din bernamêya ku pêk anîbûn, ez birime berî bîst salan. Min nefesa xwe girt û bi baleke mezin lê temaşe kir. Dema stranbêjê delal destê xwe da ber guhê xwe û bi dengê xwe yê xweş û şîrîn "Lawikê Metînî" got, ez çûme tax û kolanên gund. Dengbêjê Kevin rojên kîf û şahiyê hatine ber çavê min. Dû re keçikeke bi cilên neteweyî bi kofiyê kes û sor û zer, li nava gul û çîmenan dîlokek li ser hesreta welatê birîndar got. Ez bi xwe hesiyam ku hêstir ji çavên min tîne xwarê. Êdî ez jî nizanîm ew hestirên dilşahiye bûn, an jî yên xemgîniyê. Dema du dengbêjan dest bi "Ka bûka me?" kirin û li hev vegehandin, min xwe hê bêtir ber bi TV'yê bir û min li xeml û xêla wargeha ku lê distirîn xweş temaşe kir. Balîf û zembellîşên bi neqşên neteweyî, merşên bi tevnê çêkirî, tîr û xurçên rengîn û birîşî, dergûşekê darî û neqîşandî, Kurdistan

anî hundir û wê hengê ez ne li Stenbolê bûm êdî. Ez li gundekî Cizîrê an jî li gundekî Cûlemêrgê bûm. Dîsa min destê xwe avête çavên xwe, bihêstir bûn. Nizanim ne ji kêfan bû, an ne ji xemgîniyê bû. Hê ez wilo difikirîm, wan dengbêjan cihê xwe dane govendgirên delal. Keçikên mîna xemşên xezalan û lawikên mîna çelîyên pilingan bi "Delflo" û bi "Çaçanê" erd hejandî. Ez jî bi wan re ketime govendê û min jî bi wan re destmalên kes û sor û zer ber bi ba kirin.

Piştî bernamêyê, TV'yên tirkan hatin ber çavê min. Dema İbokê lawê cigerfiroş (İbrahim Tatlıses) bi navê "Urfa Geceleri" (Şevên Urfayê) çiqas dîlokên kurdî û hemû cil û kincên kurdan di wan bernamêyan de bikartînin. Lê muzîk kurdî naverok bi tirkî bûn. Wê hengê, mîna xîşt û xenaran di laşê min de berdî, li min dihat. Ew reqşên me yên delal û xweşik ji dijmin re dikirine mal. Desmalên sor û spî dihejandî. Lê İbo û yên mîna wî ku bi eslê xwe kurd in, bila bizanibin ku xayîntî ne tenê bi cerdevanî û sîxuriyê ye. Talankirina dîlok, stran û govendên me, ji hemûkan xerabtir e. Lê vê hengê, cîharê wan tije ka ye. Gelê kurdî êdî her tiştî zane.

Peyva cerdevanê Midyadê hate bîra min. Min jî got "Ne saetek, deqeyekê TV'ya MED'ê hêja ye heqê antena peykê."

Êdî kurdîno, ku hûn ji goştê laşê xwe bihelînin, her yekî anteneke peykê bistînin. Hûn jî mîna min hêstirên dilşahiye ji çavan bibarînin.

**JÎR DİLOVAN**



**HÜSEYİN UMAYSIZ:  
"NE ŞANOYA  
BI KURDÎ,  
ŞANOYA KURD"**

Der barê listika Sîmûrg û Ronahî, şanogeriya kurdî û bi giştî nêrîna wan a li şanoyê de, me xwest em fikrên nivîskar û derhêner-serkarê listikê Hüseyin Umaysız hîn bibin. Ji gotinên Umaysız xuya dibû ku gelek problemên şanogeriya kurdî hene. Li gorî Umaysız, wan ewilî bi tiyatroya li kuçeyan dest bi kar kiriye, lê ji ber şertan, mecbûr mane ku dev ji vî terzî berdin. Fikrên wî yê li ser van meseleyan xal bi xala wiha ye:

- Me xwest em tîpa Kosegelî û belkî ya Parsek, (mirov li gorî terza Ewrûpa bifikire) bike Palyaçoyê kurd, yanî tîpeke tiyatroya kurdî.

- Me bi zanebûn dîrok û edetên kurdî yê kevin xist nava listika xwe. Mebesta me ji vê ew e ku em çanda kurdî ya jibîrkirî, binin roja îro. Di listikê de gelek carî vegera li tarîxên berê heye, me xwest ku haya mirovên kurd ji wan tiştan jî hebe.

- Nêrîna me ya li şanoyê, li gorî diyalektîk marksîzmê ye. Ji bo vê yekê me xwest ku em di nav malzemeyê me bikar anîne de dijberî hebe.

- Armanca me ne tiyatroya bi kurdî ye, lê belê em dixwazn tiyatroya kurdan ava bikin.

- Em dixwazn di şanoya kurdan de gavên nû biavêjin, qalibên cihê biafirînin û riyên nû kifş bikin.

- Tiştên ku berê hatine afirandin, êdî têrî me nakin. Ji bo afirandina hîn tiştên nû em di hundirê xwe de janneke dibihîzin.

- Divê bersiva pirsar, 'tiyatroya kurdî çi ye' bi awayekî nû û cihê bê bersivandin û em maneyeke nû bidinê. Lazim e di vê hêlê de xemên me hebin.

Saziye kurdan, di warê çandê û hunerê de gavên nû diavêjin

# DI ŞANOYÊ DE JÎ DEWRA KURDÎ

Di nav hefteya borî de (7-15 gulan) Şanoya Hêvî li Stenbolê listikek ku xwerû bi kurdî bû, pêşkêşî temaşevanan kir.

Koma Şanoya Hêvî, bi Navenda Çanda Mezopotamya şaxê Îzmîrê ve girêdayî ye. Navê listikawan, Sîmûrg û Ronahî ye û derhêner û nivîskarê senaryoyê jî Hüseyin Umaysız e. Mijara listikê, nixandî û rexneya 'rewşenbîrên' kurd e.

Navê listikê ji efsaneya Teyrê Sîmûrg tê. Ev efsane, di nav gelê Rojhilata Navîn de tê zanîn. Li gorî efsaneyê li paş çiyayê Qaf teyrek ku navê wî Sîmûrg e, heye. Ji bo dîtina vî teyrî, heft çivîk, qerarê ji bo çûna paş çiyayê Qaf didin û dikevin rê. Di rê de gelek çivîkên din jî dikevin nav refên wan, lê bi tenê sî heb ji

van çivîkan xwe digihînin paş çiyayê Qaf. Lê dinihêrin ku Teyrê Sîmûrg (yanî sî çivîk-teyr) ew bi xwe ne.

Di berhemên edebî de (şano jî di nav de) bikaranîna sîmgeyên efsaneyan di nav çanda dinyayê de gelek carî hatiye bikaranîn. Wek mînak şanoya Hindî ya ku ji efsaneya Mahabxarata û bi eynî navî hatiye wergirtin, pir bi nav û deng e. Îcar em werin ser Sîmûrg û Ronahiyê. Listik, bi pêşekê (Kosegelî) olî (rituel) ya şahiyê dest pê dike.

Di vê destpêkê de listikvan di nav kostumên gelêrî de, yek li erbanê dixê, yek jê mêr e û di nav timtêlên bûkan de ye, yek di eyarê bizinê de ye û yê din jî bi derdora wan dikevin. Beriya listikê ev kesan tên nav temaşevanan û wan

ber bi sehneyê ve dibin. Di vê navê de gelek henek bi temaşevanan tê kirin. Mirov dibêje qey, wê listik di nav van kostuman de û bi efsaneyê dewam bike lê na, ji ber ku ev, bi tenê dewlemendî û cihêrengiyeke taybetiya şanoya kurdî ye.

Rewşenbiriya kurdan bûye mijara şanoyê. Rexne û nixandînek li ser rewşenbîreyê hatiye kirin. Li vir listika Turandot ya şanogerê Alman Bertolt Brecht tê bîra mirov. Di wê listikê de Brecht peyva entelektuel (rewşenbîr) diguherîne û dike "Tellekt-uell-In", kurte gotina wê TUI ye. Di vê listikê de şanoger qerfên xwe bi wan rewşenbîrên (entelektuel) ku di nava sîstema kapîtalîzmê de xwe winda kirine, dike.

Helbet mijara Sîmûrg û Ronahî cihêtir e. Lew-

ra mekan Kurdistan e. Di şanoyê de rexne li wan kesên ku ji xwe re digotin em 'rewşenbîr' in tê kirin. Ji dêla ku ev kesana pêşiya gel ronahî bikin, dibin hêsîrê berjewendiyên malbatî û şexsî. Di vir de pîrsek derdikeve holê: Gelo rewşenbîrî çi ye? Helbet rewşenbîrî li gorî welatan nayê guherîn, ji ber ku pîvana rewşenbîriyê li her derê dinyayê divê yek be.

Di şanoyê de 4 listikvan, hem gel hem ruhê wan kesên ku di rîya mûcadeleya welatparêziyê de xwe feda kirine temsîl dikin. Li gorî hereketên rewşenbîr (Kemal) tewra wan jî diguhere. Gava ew tiştên balkêş dibêje, ber bi wî de diçin û guhê xwe didinê, gava li ser doza kurdî tiştên nebaş dibêje, yanî ji hewcedariyên wezîfeyên xwe direve, ezab dikşînin. Lê di van sahneyan de Kemal wan nabîne. Ta ku wexta lehengê listikê, yanî 'rewşenbîr' Kemal ji ber fikrên jina xwe yê rast, destê xwe li jina xwe radike, ew mudaxele dikin û ew bedenên bêdev û bê sîma, ji nişka ve derdikevin pêş Kemal û wî disekinînin.

Listik, li ser wezîfeyên rewşenbîriyê ye. Di listikê de rewşenbîrên ku lazim e rê nîşanî gel bidin û ji ber kêmasî û berjewendiyên xwe vê wezîfeyên xwe nakin, bi awayekî dorfireh tên rexnekirin. Bi gotineke din



gel dixwaze bi 'rewşenbîr' bide zanîn ku wan, ew afirandiye, lê ew, li wan xwedî dernakeve û wan nas nake. Di hundurê listikê de eleqeya dîne Zerdüştiyê, edetên kurd yê kevin, di guherîna replîkan de tên û diçin. Li gorî derhêner, bi xêra van guherîn û hereketan, ew dikarin bala temaşevanan her gav zindî bigirin.

Listikeke Epîk e, lê ji gelek hêlan ve jî trajîk e. SUUT KILIÇ



Dîmenek ji listika "Sîmûrg û Ronahî"

## Nûbihar: Umet ji pareyan tê pê

Nûbiharê, hejmara xwe ya 30'an weşand û tê de balê dikeşîne ser gelsên neteweyî. Kovara mehane ya çandî, hunerî û wêjeyî Nûbihar, ku li Stenbolê derdikeve, bi sernava "Îhmaleke tarîxî: Di Îslamê de heq û hiqûqê mîletan" rê li ber gengeşiyên li ser vê mijarê vedike. Di sergotarê de wiha tê gotin:

"...Xwedayê ku milêten muxalîf afirandine, lazim e ku ji bo danûstandinên di

nav wan de qeyde û rêzik ferman kiribin. Lê belê ji ber ku pîrsa mîlet û milliyetê nisbeten pîrseke nû ye, mixabin alimên îslamê di warê heq û hiqûqê de an ev wekî beşeke muhîm nenixandine, an jî ji aliyê menfî ve lê nihêrtine û ew bi tevahî red û înkâr kirine." Di pey wan daxuyaniyan de jî ev tespît tê kirin: "Piraniya mislimanan fikirîne ku eger behsa umetê bikin, wê her tişt çareser bibe. Lê ji bîr kirine ku u-

met ji pareyan tê pê û eger pareyên umetê ne salim û zexim bin, umet jî ne salim û zexim e."

Kovara Mehane Nûbiharê di vê hejmara xwe de dîsa cih daye nivîsên têvel (muxalîf). Hin ji van ev in: Cankurd "Guhertina elfabeya kurdî", Bavê Zîn "Îmlaya kurdî", Felat Dilgeş "Rexne û xwerexnekirin", Newzad Nurullah "Em û Seydayê me Ustad Bedîuzzaman Seîdê (Norsî) Kurdî".

## Nûbihar



Îhmaleke tarîxî:  
Di îslamê de heq û  
hiqûqê mîletan

Di nav împaratoriya Osmanî de rewşa warên mîrekên kurd

# Mîrê me girtin lo mîro, birin Stenbolê pismîro

Mîrê Botan Berdir-xan Begê navdar, berî serhildana li hemberî Osmaniyên kedxwar, sala 1842'yan, di gel hin mîrên kurdan ên deverê "Peymana Pîroz" çêkir. Pêşengên ku ketin civînê, ji bo parastina hikûmeta kurd soz dan û sond xwarin.

Yek ji wan jî Mîrê Hekariyan Nûrîlah Beg bû. Gelê herêmê jî mîrê xwe re digotin "Nûrî Beg". Zavayê Bedirxan Beg bû. Mîrîtiya Hekariyan ya nivserbixwe, di 1360'an de hatibû sazîkirin. Bine-mala wî di rojên xweş û nexweş de, 487 salan rêveberiya eşîrên Hekariyan kir. Firehiya xaka di bin destê wan de, li dora 25 hezar km<sup>2</sup>'yî bû. Tixûbê wan jî aliyê bakûr ve, digihîştî girava Wanê.

Di nava împaratoriya Osmanî de 5 mîrên kurdan ên serbixwe yek ji ew bûn. Peryên wan bi xwe hebûn, xutbe jî li ser navê xwe didan xwendin.

Gerokê tirk Ewliya

Çelebî di gernameya xwe de dibêje: "47 hezar leşkerên wan hebûn, ji leşkerên wan re digotin "çelo", ew bi lehengî û mîrxasiya xwe dihatin naskirin."

Nivîskarê Şerefnameyê Şerefîxan bi van rêzikên jêrê pêşna wan dide. "Rastî ew e ku ew binemal û hikumdar di nava hikumdarên Kurdistanê de, bi bilindahiya esl û binyat û xesiyatên baş ve tene naskirin. Siltanên mezin tu caran êrîş û çavên xwe nexistine ser standina axa wan."

### Mîrek rûmet didan zanîne

Tenê di nava Cûlemêrgê de Medresa Zeynel Begê, ya Yêzdan Şêr û ya Meydanê xwendigehên girîng bûn. Ji bilî xwedina olî; wêje, dirrok, erdnîgarî û dad jî didan xwendin. Melayê Bateyî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Şerefîxanê Culemêrgî, Pertev Begê Hekarî û gelek şair û edîpên din berhema wan



medersan in. Ji bona wê yekê vekolînerê hêja Sadiq Baadî Amêdî yê nemir di pêşgotina dîwana Pertev Begê Hekarî de dibêje: "Pertev Beg ji binemala Mîrê Hekariyan bûye, ji ber wê bi navê Şah-Pertev-Beg nav dane, ji mala camêr, xweşmêre balber û xêrxwaz da hatiye dinyayê û ji dayika xwe bûye û mezin bûye. Cî û wargêt ew tê da mezin bûye, ciyê sirîşt, rengîn, bi deşt û çiya, gol û havîngeh û zozan bûye. Ew cî warê zanîst û tore klasîkê kurdî bûye."

Di nava wan şairên binavûdeng de Pertev Beg û Şerefîxanê Cûlemêrgî, zarokên mîrên Hekariyan in. Tê zanîn ku herduyan jî mîrîti jî kirine. Li vir xuya dibe ku, mîrên Hekariyan nîrxek, girîngiyek dane zîmanê kurdî. Hemûyan jî xwendina medresan dîtîbû û şahidname standîbûn. Ji bilî kurdî, farisî û erebî jî baş dizaniyan.

Min mijara nivîsîna xwe belav kir. Bila xwendevanên birêz min bibexşînin. Sedemê nivîsîna van gotinan ew bû ku, da dagirker nebêjin mîrên kurdan nexwendî û nezan bûn. Bila hemû kesên xwedanrûmet bizanin ku, kedxwerên biyanî xweşî, delalî û spehîtiyên kurdan ji holê rakirine û bi damezirandina komarên xwe yê nîjadperest medreseyan, hêfnên zanîstê (ilmê) kirine girtîxane û zîndanên kurdan.

Nûrî Beg jî wekî hemû begên Hekariyan

xwende, egît û zana bû. Ji koledariya biyaniyan hez nedikir. Di nava serhildana Bedirxan Beg de cihê xwe girt. Piştî faşîbûn û girtina Bedirxan Begê jî 2 salan li çiyayên Hekariyê, berxwdaneke birûmet da domandin.

Nurallah Beg, mîrekî ku hevalê gelê xwe yê malbatî û mîratiyê gişt berze kirin û binemala wan belav bû. Di rojên teng de gelê xwe nehêla tenê. Kurdên li kêleka xwe bi erzanî nefirotin. bi hev re rabûn û bi hev re jî malwêran bûn. Ji bona wê yekê, kurdan qenciya wî ji bîr nekir. Li ser çûyîna wî stran û helbest çêkirin. Straneke li ser wî û hatina dagirkeran a deverê, bi navê "Heylo lo Mîro" li jêrê ez dê pêşkêşî xwendevanên Welatê Me bikim û tégihîştin û nîrx a wê dê bihêlim dilê wan.

### Straneke 148 salî

Her wekî tê zanîn, bi aliyê rojavayê ve êrîşên peşiyê, romayîyan anîne ser Kurdistanê. Kurdan piştî romayîyan jî, ji Selçûqî û Osmanîyan re jî dîsa gotine romî. Ev stran 148 salî ye. Niha jî di govendên Cûlemêrgê de serstran ew e. Hatina ala biyanan li deverê kevnahî û şêrîniya çanda kurdî ya bi deng û dilkovanî û dilsojîya gel di rêzikên wê de xuya ne.

Dibe, xwendevanên qedirbilind vê nivîsê xelîet tégihîştin û ji bo min bibêjin kevneperest e an jî daxwaza paşvehatina derebegîtiyê di dilê wî de ye. Bûyer ew nîn e.

Ez dibêjim ew roj gelek ji yê demê komarên faris, tirk û ereb ên nijadperest ronahîtir û geştir bûne. Ji ber ku nîrxên neteweyî ewqas nehatine înkâr û windakirin.

Kela Cûlemêrg lo mîro,  
li ser kevîrî pismîro  
Romiyek hato lo mîro,  
ala vekirî pismîro  
Nurî Beg girtin lo mîro,  
eirê gawirî pismîro

Kela Cûlemêrg lo mîro,  
li nav çiyayî pismîro  
Romiyek hato lo mîro,  
ala deynayî pismîro  
Mîrê me girtin lo mîro,  
emrê paşayî pismîro  
Kela Cûlemêrg lo mîro,  
mayî bêtêx e pismîro  
Erîşek hato lo mîro,  
ji vî paytext e pismîro  
Mîrê me girtin lo mîro,  
Roma bêbêx e pismîro

Hêj Cûlemêrgê lo mîro,  
heta pêş dêrêzê pismîro  
Bejna mîrê me lo mîro,  
take nêrgîzê pismîro  
Nûrî Beg girtin lo mîro,  
birine Tebrêzê pismîro

Hêj Cûlemêrgê lo mîro,  
heta rezanê pismîro  
Bejna mîrê me lo mîro,  
take rihanê pismîro  
Mîrê me girtin lo mîro,  
birin Tahrânê pismîro

Kela Başkalan lo mîro,  
li derê dolê pismîro,  
Bejna Nurî Beg lo mîro,  
take Sorgulê pismîro  
Mîrê me girtin lo mîro,  
birin Stenbolê pismîro

Çavkanî:  
1-Şerefname, rûpel 107  
2-Prof. Qanatê Kurdo,  
Tarîxa Edebiyata Kurdî,  
rûpel 128.

Î. CÛLEMÊRGÎ

## Ji dîroka rojnamevanîtiya kurdî, rojnameyêke hefteyî

# ŞARKIN SESÎ

Ev "rojnameyêke hefteyî, siyasî, civakî ya serbixwe" bûye, û bi zîmanê tirkî derketiye. Xwedî û yê ku karûbarên nivîsan îdare kiriye, Samed Avşar e.

Malmîsanîj û Mahmûd Lewendî di kitêba xwe ya "Li Kurdistanê Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1992)" de, dibêjin ku wan 6 hejmarên vê rojnameyê dîtine. Rojnameya Şarkin Sesi (Dengê Rojhilat) hejmarê xwe ya pêşîn di 18.5.1950'yî de derxistiye û ketiye nava jiyana rojnamegeriya kurdî.

Di vê berhema hêja de em hîn nabî ku rojnameyê li ku derê dest bi weşana xwe kiriye û tevî hev çend hejmar derketine. Bi tenê em ji kitêba Malmîsanîj û Mahmûd Lewendî hîn dibî ku hejmara yekemîn di 18.5.1950'yî de hatiye weşandin. Ên din jî:

- Hejmar 2: 21.9.1950
- Hejmar 3: 28.9.1950
- Hejmar 4: 5.10.1950
- Hejmar 5: 12.10.1950
- Hejmar 6: 19.10.1950

Hewce ye ev jî bê gotin, ev her şeş hejmar jî 4 rûpel in û pîvanên wan 49,8x34,2 cm ne.

Nivîskarê vê kitêbê didine xuyan ku rojname di hejmara xwe ya pêşîn de ji îktîdara Partiya Demokrat (De-



Berga rojnameya "Şarkin Sesi"

mokrat Partisi) ya Adnan Menderes bi awayekî erênî (pozîtîf) behs kiriye. Her wiha rojname di nava vê partiyê de navê mebûsên "rojhilat" Dr. Yusuf Azizoğlu û Ebûqat Remzi Bucak jî diyar kiriye.

Di hejmara pêşîn de navê van kesan dibihure ku tê de nivîs nivîsandine: Samed Avşar, Diyarbekirî, Dadaşî, Yaşar Alhas, Alhasî, Cuma Hilmi Çelakul, Nazım Önen, Altuni, Cevdet Altun, Suphi Menteş, Dr. R.E., A.Ekrem Uğurlu, Behçet Direkçi, Gülham Öztörun, M. Şevki Yazman.

# Em dinyayê nas bikin

Gelî zarokan hûn dizanin geh he-wa sar e, geh germ e û geh jî hênik e? Çima zivistanan şev dirêj in û havinan jî kin in? De ka werin em bi hev re hinekî dinyayê nas bikin.

Dinya berî niha bi hezar salî mîna giloke-ke agirê bizot bûye. Hingî ku li dora xwê ziviriye sar bûye. Berê ewr çêbûne, pişt re pirbaran barîne. Çalên ku

li ser rûyê erdê hebûne tijî bûne. Gol behr û çem çêbûne. Di pey wan re çêre û hêşinahî, dar benderih derketine meydanê. Berê mîna kurmikan hûr û biçûçikî bûne. Mirov çêbûne.





Serê pêşîn her kes wekî xwişk û bira bûne, bi aştî jiyana xwe domkirine. Lê hin mirovên çavnebar çav berdane keda mirovên din. Xwestine nexebitin, karekî nekin û debara

xwe bikin. Wekî axa û began. Di pey re şer û pevçûn, koletî zordestî ketiye nava mirovan.

Dinya gilover e. tim aliyekî wê ronî û yek jî tarî ye. Ji ber ku gilover e hem li dora xwe û hem jî li dora rojê digere. Dinya gera li dora xwe di 24 saetan de temam dike. Bi vê gerê şev û roj çêdibin. Li dora rojê jî di 365 rojan de digere. Ev dibe salek. Dema ku dinya li

dora rojê dizivire yanê digere, carinan jê dûr dibe, carinan jî nezikî wê dibe. Gava jê dûr dikeve payiz û zivistan, gava nêzikî wê dibe bihar û havîn çêdibin. em ji wan re jî dibêjin werz.

Zarokino! Li Kurdistanê salek çawan e, mirov di kîjan mehê de kar û şixul dike, heke hûn dixwazin hîn bibin li vê çiroka me ya helbestekê binihêrin.



## ÇIROKA SALEKÊ

Heft roj dibin hefteyek  
Sî roj dibin mehek  
Dozdeh meh salek e  
Çiroka mehan çî xweş e  
Li min guhdarî bikin

Meha adarê av dihere guliyên daran  
Cejna Newrozê pîroz dibe di vê mehê de  
Gul û kulîk dipişkivin di avrêlê de  
Mih û berxan berdidin dangiyan  
Yek gulan cejna karkeran  
Heşîn dibe her derê Kurdistan

Sîrîng û Sipîng, kereng û ribêz  
Gur dibe ava di çeman de  
Çî xweş e werza biharê

Mal diçin waran bi germa pûşperê  
Giha diçinin pale, li mêrgan  
Zozan çî xweş in di germa tîrmehê de  
Giha lod dikin, kayê dikin kadinê  
Dîroka kurdan ji nû ve hate nivîsandin  
Artêşa me ava bû di pazdehê gelawêjê de

Şev kin dibin, roj dirêj in  
Pûş dibin giha, li çolê  
Çî germ e, werza havînê

Cotkar li zeviyan cot dikin di rezberê de  
Ji bo zivistanê xurek kom dibe di vê mehê de  
Meha kewçerê dar pelan diweşînin.  
Legleg û quling difirin ber bi başûr ve  
Derve sar dibe, sobe tèn danîn  
Berf dibare di meha sermawezê de

Dims û bastêq, dan û savar  
Çêdikin di van mehan de  
Çî xweş e werza payîzê

Di meha berfanbarê de av cemedê digirin  
Zarok li ser berfê xwe xist dikin bi taxûkan  
Rê tèn birin ji berfê, gundî naçin bajaran  
Her der spî ye, çî sar e rêbandan  
Bizîn û mih dizên di reşemiyê de  
Cih bi cih berf dihele, berfîn dibişkivin li çîyan

Salek qediya, saleke nû tê  
Newroz sersala me ye  
Çî xweş e, werza zivistanê

ROTÎNDA YETKÎNER

# N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

## Li benda nameyên we me

Berî ku dest bi nameya xwe bikim, hemû xebatkar û xwendevanên Welatê Me bi silavê şoreşgerî û welatparêziyê silav dikim, jiyanêke bi aştî û azad dixwazim.

Ez nameya xwe li Girtîgeha Nîvvekirî a Zincidere ya Kayseriyê dinivîsim. Rojnameya Welatê Me bi qandî derfeta xwe ez dixwînim. Pîr û pîr dicibînim. Hinek daxwazên min ji we hene.

Ku hûn van daxwazên min bînin şûnê ezê pir dilxweş bibim. Ji vêga ve ez spas dikim. Daxwaza ewilî, ez xaçepirsê amade dikim û dixwazim ku ji we re bi rê bikim, hûn jî biweşînin. Daxwaza min a din jî ez dixwazim ku xwendevanên "Welatê Me" ji min re bibin hevalê nameyan û em ji hev re nameyan bi rê bikin.

Careke din li we hemûyan silav dikim. Di weşana we de ji we re serkeftinê dixwazim.

**Jêrenot:** Hevalên ku bixwazin bila ji kerema xwe re nameyan ji xwendevanên me yê hêja re bişînin vê navnîşanê

**Murat Caymaz  
Zincidere Açık Cezaevî  
Kayserî**

## Welatê Me nayê Şirnexê

Rojnamevanên hêja, ez silavên şoreşgerî ji Cudî û Gabar û Herekolê ji we re pêşkeş dikim. Îro li Botan bihar di xweşiyê de hatiye. Em dixwazin ev bihar bibe bihara azadiyê.

Me rojnameya Welatê Me, li Amedê stand. Li Şirnexê rojnameya Welatê Me tune ye. Heke hebe jî, cerdevan û polîs nahêlin gel bistîne. Şerê azadiyê îsal pir geş e. Ji bo wê qasê em bawer in ku tekoşîna gelê me, di

demeke kin de li ser xweşiyê raperîn bibe.

Ez nameya xwe xelas dikim, hûn hemî bimînin di xweşiyê de.

**Dicle Özcan/Şirnex**

## Welatê "terorîstan"

Ji wextê ku ez bizwerbûme û min xwe dîtî ye heta vêga kurd di şer de ne. Ev şer, ji sedsan ve ye ku dikin, geh li dijî dijmin û geh jî li dijî hev. Lê, her û her kuştin, talankirin û koçberî bi wan re ye. Û her tim jî ne bi navê xwe tèn naski-

rin. Qet devê dijmin nagera ku bibêje kurd an jî Kurdistan. Navên wekî eşqiya, xayîn, çete û hwd. di dawiyê de jî navê neteweyî li wan kirin. Gotin: "Terorîst"

Hebûna kurdan înkâr dikin. Hetanî beriya çendekî serokomarê tirk ji rojnamevanên biyan re digot, tu gel bi navê kurd tune û dever û welat jî bi navê Kurdistanê tune. Êdî hema yan jî me û yan jî, ji wan. Me kodika vala li ya tijî xistiye, bi Xwedê ji me re vegeer nemaye. Me qîma xwe bi "terorîstiyê" anî û bila welatê me jî "Terorîstan" be. Kî terorîst e kî ne terorîst e, eşkere ye. Lê wekî dibêjin: "Şeko meko navê xwe li hevalê xwe ko."

**Remazanê Hûrî/Îzmîr**

## Mizgîn li we


Ez bala xwe didimê; bêhna azadî û xelasiyê tê. Û ez dibêjim gelê kurd şertên xelasiyê yek bi yek bi cih tîne. Divê mirov hin tiştan bibîne. Rewşa beriya 9-10 salan û îro gelo wekî hev in? Îro dijminê gelê kurd wekî mirîşka şerjêkirî di-perpîte û dixwaze temenê xwe dirêj bike. Lê belê têkoşîna gelê kurd û serokatiya gelê kurd wê emrê wan kurtir bike. Ez mizgîniyê didim welatparêzên kurd, bila netirsin. Xelasi û azadiya me ne dûr e.

**Evdile Firat/Mêrdîn**

Xwendevanên hêja! Ev bû şeş meh ku Welatê Me birêkûpêk derdikeve. Di gel hin kêmasî û qelsiyên, em bawer in ku Welatê Me di warê jiyandin û pêşvebirina rojnamegerî, çand û zimanê kurdî de karekî pêwist didomîne û derketina rojnameyê wisa xwerû bi kurdî firsendeke girîng e ku divê jê bête istifadekirin.

Di vî warî de dewlet hin astengiyan derîne pêşiya me jî, gerek e em bi paş ve gavan neavêjin û bi çavê mewziyêke têkoşinê li rojnameya xwe binêrin. Bi vê mewziyê, derfetek ketiye destê me ku bi navgîna wê em dikarin lipaşmayîna civaka kurd a di warê çand, ziman û rojnamegeriyê de telafî bikin, dû re jî xwe bigihînin civakên bipêşveçûyî yê hemdem.

Di vê têkoşinê de serkeftin bêyî ezim û îrada xebatê ne mimkûn e. Lê ezim û îrad jî ne bes in. Ji xeynî wan hestên dinamik, pêwist e em pirs-girêkên ku di pêvajoya xebatê de derdikevin pêşiya me rast tesbît bikin û ji bo çareserkirina wan bi rêxistinî xebatên xwe bidomînin.



JI WELATÊ ME  
MAZHAR GÜNBAT

Welatê Me ji bayian bixwazin

Di pêvajoya şeş mehan de gelek pirs-girêk derketin pêşiya me û li gorî derfetên xwe em li çareserkirina wan geriyên. Niha ez dixwazim li ser çend astengên ku vîtêsa meşa me kêmdikin, bipeyivîn û divê em hevûdin haydar bikin da ku çareseriyên pêwist bibînin. Yek ji van astengan di warê belavkirina Welatê Me de ye. Mixabin heta vê gavê Welatê Me li gorî dilê me baş nehateyê belavkirin.

Me pêvajoya şeş mehan, bi du riyên rojname digihandin xwendevanên xwe. Rojname hem bi navgîna şirketa BBD'ê, hem jî bi destên belavkarên me dihatin belavkirin. Dawî me tesbît kir ku bi du riyên bi hev

re encameke baş ji vî karî nayê standin. Em têgihîştin ku lazim e ji her du riyên yekê hilbijêrin û rojnameyê pê belav bikin. Wekî ku ne mimkûn e em bi destan wê bigihînin hemû deveran, ya rast û pêwist ew e ku em bi navgîna BBD'ê (şirketa belavkirinê) em rojnameyê bişînin cem hemû bayian.

Helbet, ji bo ku em ji vî awayî encameke bi dilê xwe bixwazin, hin daxwazên me ji xwendevanên me hene. Lazim e xwendevanên me rojnameyê ji bayian bixwazin, eger tune be hesab ji wan bipirsin û ew bayiyên ku rojnameyê nafirosin tesbît bikin û navnişana wan ji me re bi tele-

fonê bibêjin. Welatê Me rojnameyê legal û meşrû ye, bi awayekî serbest kirin, xwendin û danxwendina wê mafê hemû xwendevanan e. Ji ber vê yekê divê her xwendevanê me, wekî yê hemû rojnameyên din li vî mafî xwe bigerin.

Mixabin, taybetiyeke xerab a xwendevanên kurdî heye; ji dûr ve li vîtrîna bayian dinêrin, dema nabînin dibêjin qey rojname li cem bayian tune û naçin napirsin.

Divê baş bête zanîn ku Welatê me li cem hemû bayiyên normal hene û bayî jî mecbûr in wê bifiroşin. Eger nefiroşin mafê me heye em wan bidin mehkemeyê.

Rojnameya xwe ji bayian xwestin mafê we ye herî xwezahî ye. Gerîna li mafê xwe di kîjan warî de be bila be, têkoşineke birûmet e.

Niha pirs-girêka herî mezin ev e (belav kirin) li pêşiya me, em bawer in ku em ê bi hev re wê çareser bikin. Formul ev e. Bi îsrar bi îrad, bêtirs ji bayian Welatê Me bixwazin. Ger pirs-girêkek derket li me bigerin.

Bimînin di xweşiyê de.

WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
ROZA Basın ve Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)  
**Aynur BOZKURT**

Gerîndeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
**Mazhar GÜNBAT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran  
(Yazışleri Müdürü)  
**Metin AKSOY**

Berpirsiyarê Nûçeyan  
(Haber Sorumlusu)  
**Suut KILIÇ**

Redaktor  
**Sami TAN**

NAVNIŞAN (Adres)  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX  
293 53 19 - 245 29 91

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ  
(Temsilcilikler)

**Suriye**– Jan Dost  
Fener Rojbiyanî  
**Berlin**– Silêman Sido  
Sîrwan Reşîd  
49-30-69 00 26 95  
**Bonn**– Ahmet Baraçkılıç  
49-228-66 62 49  
**Hannover**– Selîm Biçûk  
49-5721-813 60  
**Hamburg**– A.Hekim Gülsün  
49-40-40 33 88  
**München**– Mahmut Gergerî  
49-871-670 884  
**Badenwürttemberg**–  
A. Rahîm Ayaz  
49-75453258  
**Swed**– Amed Tigris  
46-8-740 69 81  
**Amsterdam**– Cotyar Zaxoy  
31-20-613 07 66  
**Paris**– M.S. Ayçiçek  
33-1-48000401  
**Atina**– Ferhan Zêbarî  
30-13634905  
**Bruksel**– Medenî Ferho  
32-16-49 07 67

Demokratîkbûn û Tirkiye

Ji ber rexneyên sazîyên aştîxwaz ên navneteweyî û pêkûtiyên dewletên biyan "rakirina qedexekirina sûcên ramanê" ketiye rojê hikûmetê. Li derdorên hikûmetê jî tê gotin ku dixwazin paketa demokratîkbûnê vekin(!) Alîkarê Serokwezîra Tirkiyê Hikmet Çetinê Licîyê dibêje: "Hebûna qedexekirina ramanan, ji bo Tirkiyê şermeke mezin e, rojek berê rojekê divê em xwe ji vê şermê bifilitînin."

Mirovên ku rûyên van kes û derdorên destbixwîn yê rastîn nizanibin, karin bibêjin "dibe ku tiştekî baş bikin." Lê gava ku mirov li kirin û gotinên van rayedarên dewletê binihêre, xuya dibe ka armanca wan çî ye.

Ji ber ku li Tirkiyê her roj mafên mirovan ji aliyê hêzên dewletê ve bîpê dibin û wî karî jî bi qanûn û dadgehên xwe dikin; ji aliyê gelek kes, sazî û komeleyan ve bi rexneyên giran tîn rexnekirin. Gelek caran jî, ji ber van hovîtiyên xwe li dadgeha mafên

mirovana Ewrûpayê tîn darizandin (mekemekirin) û cezakirin.

Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyê nema kare welatê xwe li hemberî dinê biparêze û ji ber vê yekê dewlet nema kare Wezîrê Karê Derve li ser kar bisekinîne. Her ku wezîrek direve heta ku yekî din dixapînin û tînin ser kar, yê beriya wî ji hev dikeve (Wek ku tê zanîn Erdal İnönü vê carê xapandin).

Qebûlbûna serlêdana ji bo endamiya Yekîtiya Gumrikê, bi demokratîkbûna hiqûqa hundurîn ya Tirkiyê ve hatiya girêdan. Ji ber van û gelek sebebên din dewlet mecbûr maye ku di hiqûqa xwe de guherînan çêbike.

Dibêjin "Em dixwazin benda Qanûna Têkoşina bi Terorê re ya 8/1'an biguhêrin", bi ya wan, bi vê kirinê wê dewlet bibe demokratîk. Tewlo, tewlo, tewlo...

Bi rakirin an guhertina vê qanûnê re, pir wê mamosteyên hêja Beşikçi û Haluk Gerger û çend ronakbîrên nas-kirî ji girtîgehan bîn

berdan, an jî Yaşar Kemal neyê mehkemekirin (Ev jî ne ku dewlet ji wan kesan hez dike. Bes ji bona ku siyaseta xwe li derve bimeşîne).

Wexta ku biroj mirov ji aliyê hêzên dewletê ve bîn kuştin, mirov di binçav de bîn windakirin, bi emra wezîr û serokwezîran sazîyên kurd (partî, rojname, komele û hwd.) bîn bombekirin, bi hezaran gund bîn valakirin û şewitandin, heta ku ev şerê qirêjî bidome, heta ku hebûna kurdan neyê qebûl kirin û mafê wan di bin piyan de be, çawa wê behsa hebûna demokrasî û aştîyê bibe?

Kengê ku parlemtoya wan karibe dewleta di hundirê dewletê de (kontrgerîla û hwd.) ji holê rake, wexta ku wezîrek bi dozgerê Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) karibe an jî karibe polîsekî ceza bike, wê gavê dibe ku mirov bawer bike.

An na tohbe be.

MAMOSTE  
BEDRAN BÉNAV

RONAHÎ

EM DIBÊJIN KU, BILA RASTÎ ÊŞKERE BE;  
EM DIXWAZIN KU, BILA HERKES RASTÎ BIZANIBE;  
HÊVIYA ME EW E KU, AŞTÎ BIBE...

Rojnameya we RONAHÎ bi şîra "Nûçeyên Rast-Şîroveyên Realîst" roja Yekşemê, 21'ê Gulanê dest bi weşana xwe dîkel  
**EWÊN KU YARMETIYÊ DIDINE RONAHÎ EV IN:**  
Ferhad Can, Server Tanilli, Münir Ceylan, Mehmet Uzun, İbrahim Aksoy, Öner Yağcı, Cezmi Ersöz, Aydın Öztürk, Mahmut Alınak, Hasan Yıldız, Yılmaz Çamlıbel, Mehmet Bayrak, Ahmet Can Akyol, Edip Polat, Ahmet Aras, Koray Düzgören, A. Latif Epözdemir, Şenel Gökçe, İbrahim Can, Sabah Kara, Özgün E. Bulut, Ziya Laçın, H. Hilmi Bulunmaz, Fatma Karahan, Mazhar Kara, Ender Özkahraman, Aynur Tuncer, Akın Ok, Fuat Onural, Zeynep Durusu...

Ewê ku hez dikin RONAHÎ bixwînin, pêwist e lê bigere, yan jî karmendên RONAHÎ agahdar bike. Karmendên RONAHÎ jî, bi rîya telefonê (212) 513 63 25 - 514 07 32 û bi navnişana "Atatürk Bulvarı Emlak Bankası B Blok No:148/28 Aksaray-İstanbul" li benda we ye...

AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

	Li Hundir	Li Derve
<input type="checkbox"/> 3 Meh	<input type="checkbox"/> 550.000 TL	<input type="checkbox"/> 45 DM
<input type="checkbox"/> 6 Meh	<input type="checkbox"/> 1.000.000 TL	<input type="checkbox"/> 80 DM
<input type="checkbox"/> 12 Meh	<input type="checkbox"/> 1.800.000 TL	<input type="checkbox"/> 150 DM

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.  
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi  
Hesap No: 1100264-1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.  
Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi  
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV û PAŞNAV : .....  
NAVNIŞAN : .....

Navnişana Welatê Me  
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.  
Tel-Fax: 293 53 19 - 245 29 91

Di civaka êzdiyan de hin roj û adetên girîng

# Cejna sersala êzdiyan: Çarşema Sor

Êzdî, azdahî, yezdanî, navên gelek kevnanare yên olekî ne; ola gelê kurd a kevin e. Niha jî beşek ji miletê kurd vê olê dihebînin.

Cih û warên kesên ku ji ola êzdî ne: Bakurê Iraq û Sûriyeyê, Rojhilat û Başurê Rojhilatê Tirkiyeyê, Bakurê Rojavayê Îranê ye, yanê di hundirê sînorê Kurdistanê de ne. Hejmara wan bi sedhezaran e lê, der barê herjmarê wan de tu daxuyaniyeke fermî nîn e. Bi gotineke din hejmara wan nehatiye kifşkirin.

Gelek lêkolînerên ereb li ser kok û binyada ola êzdî lêkolîn amade kirine û ew vegeandine ola îslamê. Ew bi Yezîdê kurê Muawiye Alamawî yê ku tevgera cudaxwaz di ola îslamê de çêkiribû ve girêdane, lê ev ne rast e. Ji ber ku ola êzdî, oleke kevnar, resen û cihêreng e, mîna ola Mûhemedî, Mûsewî, Îse-

wî. Têde bi sedan an bi hezaran jî dab û nêrîtên dêrîn ên ku vedigerin serdemeke dîrokî, ta hezarê çaremîn ê berî zayînê hene.

## Dijwariyên li pêşiya lêkolînên li ser êzdîtiyê

1. Nebûn û windabûna pirtûk û berhemên lêveger ên olî, wekî ku em dizanin du pirtûkên êzdî hene; Cilwe û Mishefa Reş. Ev jî nakevin xaniyên pirtûkan û bi taybetî Cilwe pirtûk nayê jimartin. Ji ber ku bi tevahî nagihîje 500 peyvî. Ev hêlek, ji hêla din ve dijmin û neyarên kurdan û yên êzdiyan, gelek pirtûkên giranbuhayê şewitandin û hin jî wan jî avêtin çem û robaran.

2. Zor û zordestiya ku ola êzdî dîtiye, ji dema Împaratoriya Sasani, dewleta îslamî û Împaratoriya Osmanî ta îro. Hemû rengên çewsandinê,

îşkence û jenosîdê li ser wan hatine pêkanîn. Ji ber ku êzdî xwedî li bîr û baweriya ola xwe derketine.


3. Yek ji egerên ku alîkar bû û bû sedemê herîşandin û windakirina bingeha ola êzdî qedexekirina xwendin û nivîsandina li ser mirîdên vê olê ye. Qedexebûnên li ser destên xwediyên desthilatên wê demê û sedemên çewsandinê ku bi serê wan de hat, hişt ku êzdî li xwe vegeerîn û li ser derî bîne girtin û ola xwe jî veşêrin, bi tirs di nava xwe de belav bikin. Ola êzdî jî mîna olên din xwediyên bingeh û erkan e, xwediyê nimêj hec, cejn û rojgirtinê ye.

1. Cejna Çarşema Sor a serê Nîsanê (Cejna sersala êzdiyan)
2. Cejna Hecê (Cuma ya Şexadî)
3. Cejna Çile, (Herdu çileyên salê yên havîn û zivistanê)
4. Cejna Rojiya Êzdiyan
5. Cejna Qurbanê
6. Cejna Xidirilyas

## Cejna Çarşema Sor a serê nîsanê

Di vê rojê de Tawûsê Melek serekeyê firîşteyan (melekan) dakete ser rûyê zemîn. Ev di çarşema yekemîn ya meha avrêlê (nîsanê) de qewimiye. Ev, li gorî salnameya zayînî, teqabûlî 14'ê avrêlê dibe. Êzdî di vê cejnê de van dab û nêrîtan pêk tînin:

- Xemilandina mal û



Ji bo misilmanan Kabe jî be, ji bo êzdiyan jî Laleş ew e.

xaniyan bi şaxên kesk ên daran, tevî gul û kulîlkên sor

- Wergirtina cil û bergên nû

- Serdanî û pirsîna li rewşa hev

- Rengandina hêkan bi rengên cure bi cure û ji mêvanan re pêşkêşkirina wan hêkan

- Dayîna qurbanê, her kurdê êzdî li gorî hebûn û rewşa xwe vê qurbanê an jî adeka xwe tîne cih (ga, mîh, beran, mirîşk)

- Belavkirina xwarin û vexwarina li malbatên haltenik û desteng

- Serdanên gorên êzdiyan. Û li wir vexwarina şire û şerbetê

## Çima Çarşem Sor e?

Cejna Çarşema serê nîsanê bi rengê sor tê girêdan, ji ber ku di vê rojê de zehf qurban tînin kirin, mal û xaniyên êzdiyan bi hemû cureyên gul û kulîlkên sor tînin xemilandin. Dîsa hêkan bi giştî bi rengê sor û yên nêzîkî wî direngînin.

Êzdî, ji ber ku bawer

dikin Xwedê di vê rojê de stêrk Mêrkar afirandiyê û dîsa di vê rojê de cara yekemîn Tawûsê Melek Serekê firîşteyan bi fermana wî daketiye erdê, vê rojê pîroz dibînin.

## Pêdivî û pêwistiya vê cejnê

Di nava êzdiyan şengolê û derdorên wê de, di nava êzdiyan Başurê Biçûk û Bakur de û di nava êzdiyan dewletên li pişt Kafkasê tê pîrozkirin. Ji ber ku:

1- Êzdî li ser goran tevî qewalan, def û dahol û bilûr û sibaban hazir dibin; pişt re dest bi stranên olî dikin li ser miriyan. Li pey wan serdanvanên miriyan stranên vedigerînin, tevî qewalbêjan; bi boneya daketina Tawûsê Melek û ji bo vê yekê jî divê her mirovekî/e êzdî cilekî spehî û xweşik li canê xwe bike. Da ku bi Tawûsê Melek re rû bi rû bibin.

2- Bi boneya daketina Tawûsê Melek di vê

mehê de, qedexîtiyê û pîroztiya vê mehê heye. Lewre êzdiyan di nivê yekemîn ê vê mehê de çênabe ku bi tu karî rabê. Ne karê pîşesaziyê ne jî yê çandî û bazirganiyê. Ji ber ku meha Tawûsê Melek e û meheke pîroz e, wekî paqijî û baweriyê ye.

3- Kurdên êzdî di bin bandora baweriyê mezin de ne ku di vê rojê de (roja çarşemê dema diçine ser mezelan) bi fermana Xwedê hemû firîşteyan nûranî digihên ser rûyê zemîn û cil û bergên ademizad li wan in. Tevî nava êzdiyan dibin û wan diajon ser rîya rast û dirust. Bingeh û binyada îman û ayînên êzdîtiyê ji yên mirî û zindî, ji yên dût û nêzîk re şirove dikin.

4- Êzdî bawer dikin ku miriyên wan di vê rojê de ji gorên xwe tînin der. Lewre serdana goristanan wekî karekî pîroz dibînin. Divê êzdî biçin û bibin mêvanên Xwedê û gorên tarî.

FENER ROJBIYANÎ



Li Îranê li devera Yezdê li ser deriya atîşgedeyê sembola Ahuramazda tê xuyan.

elinewêrek

